


## Kurd ne kurdên berê ne

Hin xêrnexwaz, yên li dijî pêvajoyê, kedxwar, talanker, xwînxwar û desthilatdar hene, wê hewl bidin dîsa mîna berê provakasyon, lîstok, fen û hîlebaziyan bikin, da ku bikaribin pêvajoyê pûç bikin û desthilatiyên xwe weke berê bidomînin... ***Ahmet Aktaş/R.8***



## MHPê û înkara sozên M. Kemal

Eger MHP di vê pêvajoyê de mafên kurdan ên xwebirêvebirinê yên çand û zimanî nas neke, van mafan neke nav hiqûqê, ew ê bi kurdan re bi kîjan rêyê jiyana hevpar û welatek aram, demokratîk û hevpar damezirîne gelo... ***Cahît Kirkazak/R.6***



## Divê kurd aştiya kurewî ava bikin

Abdullah Ocalan, bi înîsiyatîfek dîrokî rabû, banga "aştî û civaka demokratîk" kir. Ev bang tê wateya vegera hişmendiya Sokrates û gihîştina felsefeya serdama civakî û jinûveavakirina sosyolojiya ku dikare pirsgirêkên gelan çareser bike...***Medenî Ferho/R.7***


***5 - 11 Çile 2026***
***Hejmar:*** 316
***Buha:*** 20 TL
rojnameyaxwebun@gmail.com

# xwebûn

xwenasîn e


# Rêwitî dê bi Azadiya Welat bidome

## JI EDÎTOR

Karwanê heqîqeta çapemeniya azad bi qedexe, sansur, mohrkirinan re rû bi rû ma lê li ser rêya heqîqetê meşa xwe her tim domand. Ev karwanê çapemeniya kurdî, sala 1992yan, bi Welat dest pê kir û bi Welatê Me, Azadiya Welat, Rojeva Medya, Rojev û rojnameyên wek wê berdewam kir. Rojnameya Xwebûnê jî wek berdewamiya vê çandê, 21ê kanûna 2019an, dest bi weşana xwe kir. Me wek rojnameya Xwebûnê di 316 hejmarên çapkirî de hewl da di hemû mijarên têkildarî gelê kurd de bibin bersiv. Em wek rojnameya Xwebûnê di rêwîtiya piştî 6 salan de erka ku me dabû ser milê xwe careke din dewrî rojnameya Azadiya Welat dikin.

Me di van 6 salan de hewl da ku di navbera Welat, Welatê me, Azadiya Welat de ku hatin girtin û Azadiya Welat a ku dê dîsa dest bi weşana xwe bike bi rola pirekê rabin. Her wiha me hewl da ku rêwîtiya rojnamegeriya kurdî vala nehêlin û vê rêwêtiyê ji qonaxekê bighînin qonaxeke nû. Em bawer dikin ku Azadiya Welat bi xwedîderketina we xwînêrên hêja dê ji berê geştir û zindîtir derkeve pêşberî we. Dê dîsa bibe dibistan û zanîngeha kurdî; bibe deng, reng û hêviya gelê kurd û kurdistanê. Bi vê bîr û baweriyê em di hemû xebatên weşana Azadiya Welat de serkeftinê dixwazin. Careke din dîsa Azadiya Welat li gelê kurd û Kurdistanê pîroz be.


Heke zimanê te erzan be...


Şoreşa gelan 10 salî ye


Agir li ezman jî vêket


Jin bajaran ji nû ve sazdikin


Pênûsa heqîqetê li erdê namîne


Li dijî tecrîdê iradeya ji pola


Xwe û xwezaya xwe biparêzin


Şengal êdî ne bêxwedî ye

## Li Parîsê şoreşa jinan hedef girtin

9ê çileyê 2013an, Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez ji aliyê Omer Guney ve hedef hatin girtin. Ev hedefgirtin ne hedefgirtineke ji rêzê bû. Sakîne Cansiz yek ji pêşenga dozê bû, Fîdan Dogan parastvana dozê ya di qada navneteweyî de bû Leyla Şaylemez jî pêşeroja vê dozê bû. Bîranîna wan jî ne bîranîneke ji rêzê ye, erkeke şoreşgerî ye. Meşa ku li ser mîrateya wan pêk tê, dê xeyalên wan nêzî pêkanînê bibe. Ji ber ku doza kuştina wan... ***Serdil Akdag/R.2***

## Li Sûriyeyê çi diqewime?

Berî çend rojan heyeteke dewleta tirk derbasî Şamê bû. Di nav vê heyetê de Hakan Fîdan, Îbrtahîm Kalin û Yaşar Guler hebûn. Heyetê bi serokê Hikûmeta Veguhêz Colanî, wezîrê karên derve û wezareta parastinê re hevdîtin kir. Her çiqas di daxuyaniyan de were gotin ku ew li ser rewşa giştî sekinîne jî, mijara sereke rewşa Bakur û Rojhilatê Suriyeyê û kurd bûn. H. Fîdan di daxuyaniya xwe de dîsa di ser HSDê re gef li kurdan xwarin. Îşareta... ***Zinar Ronî/R.7***

## Çîrokeke evîn, êş û qederê


Bêmal kilameke kevn a herêma Semsûrê ye; kilameke ku ji dilê şikestî û ji evîna bêencam hatiye avakirin. Ev kilam li ser çîroka du ciwanan e ku evîna wan bi xwîn û axê re hate nîşankirin. Bûyer li gundê Qenterê, li navçeya Semsatê ya bajarê Semsûrê, pêk hatiye. Qenter du gundên bi heman navî hebûn: yek Qentera Sîna/Semsatê bû, gundê bavê Êmê (Bêmalê), Hemê Ayîb; ya din jî Qentera Ereban bû ku li aliyê Rihayê bû. Îro her... ***Veysî Varli/R.11***



## Komelo Demokratîk de cuye

Ganî her komel goreyê ziwanê xo, kulturê xo, bawerîya xo, fikrê xo kerdox bêro qebulkerdene. Komunê xo awan bikero. Nê komunî de ganî garantîya her kesî hetê ekonomî, sosyalî, îdarî û ciwîyayîşî ra seypê bibo û hîyerarşî çinî bo. Fikrê komunî de netewperestî, ziwanperestî, kulturperestî, zayendperestî çinî bo. Ganî erjê şaran bêro qebulkerdene. No konsensusêko asgarî yo. No fikir sey DNA'yê komunî yeno qebulkerdene. No 'kok hucre' eke bibo muştereke komelî o çax komelo demokratîk beno... ***Cemîle Turhallî/ R-9***

## 'Ew rojnamegerekî enternasonalîst bû'



Rojnameger û nivîskar Huseyîn Aykol di 70 saliya xwe de li nexweşxaneya lê dihat dermankirin jiyana xwe ji dest da û bi merasimek mezin hat definkirin. Mamosteyê Çapemeniya Azad Huseyîn Aykol 51 salên xwe di nav xebatên mafên mirovan û çapemeniya azad de derbas kir. Di salan 90î de dest bi xebatên çapemeniyê kir û heta dawiya emrê xwe berdewam kir. 36 salan ked da çapemeniya azad. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, ew bi bîr anî û got: "Kesayetek ji dil û kedkar bû. Şoreşgerek mînak û enternasyonalîst bû. Wê her dem di nav têkoşîna me de keda wî zindî bimîne."

## Alternatîfa kapîtalîzmê komun e

Alî Haydar Elyakut li ser fikrên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ên ji bo civaka demokratîk û komunê nirxand û got: "Civak bi hezar salan e ku bi rêya komunalîteyan xwe li dijî pergala kujerê kastîk parastiye. Divê ew puxteya demokratîk û komunal were zindîkirin û li hemû qadên civakê komun werin avakirin. Divê li her qadên jiyanê li dijî kujerê kastîk têbikoşin û ji kolanan û heta taxan komunên xwe ava bikin. Çimkî tekane alternatîfa kapîtalîzma mijokdar pergala komunê ye... ***Hevpeyvîna Xecê Şen/R.4***

## Pirtûkeke ku dîwaran hildiweşîne

Wêjeya zindanê di nav wêjeya kurdî de xwedî cihekî taybet e û Elmo Begarî bi "Beqê Xayin" vê kevneşopiyê berdewam û dewlemendtir dike. Çîrokên wî ne tenê serpêhatiyên kesayetiyên takekesî ne, di heman demê de vegotineke gelemperî ya bieş, berxwedan û hêviya gelê kurd e. Di nav dîwarên zindanê de ku bi azadî fikirandin, bi pênûsa Begarî re dîwaran hildiweşîne û wêjeyê diafirîne. Herwiha "Beqê Xayin" ne tenê pirtûkeke çîrokan e, di heman demê de... ***Hogir Berbir/R.5***

# Li Parîsê şoreşa jinan hat gulebarankirin

Kuştina Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez li Parîsê, ne kuştineke ji rêzê ye. Ev êrişa ku pêk hat li dijî paradîgmaya azadiya jinan, hişmendiya jineolojiyê û têkoşîna jinên kurd pêk hat. Ji ber vê ev ne êrişeke ji rêzê ye

Serdil Akdag

9ê çileyê 2013an, Sakîne Cansiz (Sara), Fîdan Dogan (Rojbîn) û Leyla Şaylemez (Ronahî) ji aliyê Omer Guney ve hedef hatin girtin. Ev hedefgirtin ne hedefgirtineke ji rêzê bû. Ew guleyên ku hatin berdan encama êrişa bi pergal a hişmendiya mêrperest a ku têkoşîna azadiya jinan wek gef dibîne. Hişmendiya ku Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez hedef girt bi vê hişmendiya xwe xwest derî li têkoşîna jinan û pêvajoya aştiyê bigire ku Abdullah Ocalan dixwest bide destpêkirin .

Sakîne Cansiz di paradîgmaya azadiya jinan de werçerxeke dîrokî bû. Wê di serdemeke wisa de serî rakir ku jin wek îrade nedihatin dîtin û tenê rola piştgiriyê li dihat barkirin. Di vê pêvajoyê de got 'rola min ne tenê piştgiriya hevalên mêr e, ez bi têkoşîn û hêza xwe dikarim pêşengiyê bikim.' Bi vê biryardariya xwe wek jinek wêrek di nav koma avaker a PKKê de cih girt.

Di pêvajoya ku hat girtin de serî li ber êrişên Esat Oktay Yildiran netewand. Wê di nav îşkenceyên mêran de nûneriya jinên têkoşer kir û çok li ber polîtîkayên tunekirinê dananî. Vê sekna wê hêrsa dijminên wê mezintir dikir. Her ku êrişên li ser zêde dibûn wê bihêztir li ber xwe dida. Têkoşîna ku wê dida, hem li nav çar dîwarên girtîgehê hem jî li derveyî girtîgehê olan dida. Dijminên wê têkoşînê digotin qey dema jiyana wê bi dawî bibe dê têkoşîna wê jî bi dawî bibe. Ji ber vê yekê bû ku li Parîsê ew kirin hedef. Lê tişta ji bîr kiribûn ev bû; têkoşîna ku Sakîne Cansiz da û di ruhê her hevalên naskir de tovê wê têkoşînê reşandin, mirin têk bir û îro di têkoşîna hemû jinan de dijî.

Fîdan Dogan a ku li Ewropayê kar û barên dîplomasiyê bi rê ve dibir, wek jineke ciwan dixwest di qada siyasetê de ku bi hişmendiya mêrperest dihat birêvebirin de rengê jinan bide xuyakirin. Hebûna wê ya di qada dîplomasiyê dida nîşan dida ku têkoşîna jinên kurd ne tenê di qadên teng an jî heremî de tê meşandin.

Hebûna Fîdan Dogan a li Ewropayê ji bo hişmendiya mêrperest ne tenê têkoşîna jineke ji rêzê bû. Fîdan Dogan bi têkoşîna xwe ya azadiyê re bûyer belge dikirin û li qada navteweyî doza mafê gelê xwe dikir. Ji bo di şexsê Fîdan Doganê de li vê qadê dengê jinan neyê bihîstin, 9ê çileyê li Parîsê bû hedefa dîplomasiyeke qirêj a navdewletî.

Sakîne Cansiz yek ji pêşenga dozê bû, Fîdan Dogan parastvana dozê ya di qada navneteweyî de bû Leyla Şaylemez jî pêşeroja vê dozê bû. Leyla Şaylemez bi ciwanî, dînamîzm û rêxistinbûna xwe nûneriya pêşerojê dikir. Ev rewşa wê ji bo pergala mêrperest xetereyeke mezin bû. Ji ber ku wê xwe tim dikaribû nû bikira û dikaribû têkoşîna jinan a heyî ji nifşên nû re ragihanda. Ji ber vê yekê hedefgirtina wê hedefgirtina pêşerojê bû.

Dema em bi vê perspektîfê lê binêrin dibînin ku li Parîsê tenê sê jin nehatine hedefgirtin, di heman demê de dîroka jinan, azadiya jinan, xweparastin, jiyan û veguherîna civakê jî hedef hatiye girtin. Sakîne, Fîdan û Leyla jî li dor van xalan kom bûbûn. Ji ber vê yekê êrişa li dijî wan ji êrişa kesek wêdetir êrişeke pergalî ye. Lewma girtina dosyaya wan ne tiştek hêsan e. Heke kuştina her sê hevalan were aşkerekirin dê rûyê kujeriya dewletê jî were aşkerekirin.

Lewma kuştina Sakine Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez li Parîsê, ne kuştineke ji rêzê ye. Ev êrişa ku pêk hat li dijî paradîgmaya azadiya jinan, hişmendiya jineolojiyê û têkoşîna jinên kurd pêk hat. Ji ber vê yekê ev êriş ne êrişeke ji rêzê ye, êrişek îdeolojîk e.

Ji ber vê yekê bîranîna wan jî ne bîranîneke ji rêzê ye, erkeke şoreşgerî ye. Meşa ku li ser mîrateya wan tê meşandin dê xeyalên wan nêzî pêkanînê bibe. Ji ber ku doza kuştina wan li salonên dadgehan hatin girtin û êdî ne pêkan e ku li vir hesab bê pirsîn êdî erka herkesî ye ku paradigmaya azadiya jinan jiyanî bike.



Medya Bal

## 'Sakîne Cansiz bi wêrekiya xwe bû mînak'

Sakîne Cansiz (Sara), Fîdan Dogan (Rojbîn) û Leyla Şaylemez (Ronahî), 9ê çileya 2013an, li Parîsê bi koployekê hatin kuştin. Kujer Omer Guney piştî ku hat girtin li girtîgehê bi awayekî biguman mir. Komploya li dijî her sê jinên pêşeng pêk hat, bi salan e li her aliyê cîhanê tê şermezarkirin. Tevî salên ku derbas bûne jî bûyer ji aliyê Fransayê ve nehatiye zelalkirin.

Em der barê Sakîne Cansiz ku di komkujiya Parîsê de hat kuştin bi hevala wê rojnameger Adar Gulan re axivîn.

Adar Gulan di destpêka axaftina xwe de got ku ne hêsan e ku mirov behsa kesayetên wek Sakîne Cansiz ên ku xwe di her alî de bi pêş xistine û xwe bi civakê dane fêhmkirin bike û ev tişt anî ziman: "Kesayetên wek Sakîne Cansiz di her kêliya jiyana xwe de ji bo pêşketinê hewl didin. Ji bo mirov wê fêhm bike divê mirov pêşî têkoşîna wê fêhm bike. Wê di kesayeta xwe de têkoşîna xwe jî dida jiyandin. Her ku mirov wê nas dikir mirov zêdetir di bin bandora wê de dima. Mîrateya ku Sakîne Cansiz li dû xwe hişt, rêya têkoşîna rêhevalên wê ronîtir dike."

Adar Gulan da zanîn ku wê û Sakîne Cansiz cara yekemîn hev di 1999an de dîtiye û wiha got: " Dema me hev nas kir, em di nav hêrsa komployê de bûn ku li dijî Rêber Apo pêk hatibû. Sekna wê ya di vê pêvajoyê de bandor li ser herkesî dikir. Di wê pêvajoyê de min gelek pirs jê dikirin. Me li ser 'em ê komployê çawa têk bibin' nîqaş dikir. Bi van nîqaşan re min pirs li ser têkoşîna wê ya bi salan jî jê dikirin. Dîsa gelek pirsên li ser mêtingerî û têkoşîna Kurdistanê jî jê dihatin pirsîn. Wê ti carê nedigot ez bersiv nadim an jî ez ê piştre bersiv bidim. Di wê kêliya ku me pirs jê dikirin de bersivên me didan. Di van ewqas tevliheviyan de jî tim bi disîplîn tevdigeriya. Her sibe zû radibû û werzîş dikir. Min jî pê re werzîş dikir. Jixwe heval Sara qet nedixwest tenê tevbigere."

**Lêgerîna êzingan**

Adar Gulan wiha dirêjî da axaftina xwe: "Rojek heval Sara hat got 'rabe em ê biçin werzîşê'. Jixwe ez tim pê re diçûm lê wê rojê ji ber ku pir zêde berf bariyabû, min nedixwest biçim. Cihê ku em ê biçûna jî dûr bû. Lê wê got rabe em ê herin û di vegerê de jî bi xwe re êzingan bînin. Ji bo ew zêde neweste min dabû pêşiya wê. Piştî ku berf êdî ji ser serê min jî derbas kir got ka em werzîşa xwe li vir bikin. Piştî werzîşa me qediya got were em herin ber dara li hember. Lê dar 50-60 metre dûrê me bû. Digot divê em biçin êzingan bînin. Em di nav berfa de li çiqilên daran digeriyan. Lê me nikaribû bidîta. Piştî demek dirêj me tenê çiqilek dît. Em bi hev keniyan. Wê bi israr digot divê em bê êzing venegerin. Me mêze kir ku nikarin êzingan li wir kom bikin vê carê me berê xwe da êzingên xwe yên ku me berê kom kiribûn. Ji ber ku berf pir zêde bû me nikaribû wan jî bidîta. Em neçar man vegerin, lê di vegerê de jî bi çiqilê di destê xwe de dikenin. Ji ber ku me destvala vegerandinê wek binkeftinek didît, me got em herin nav daristanê û darên hişk bînin. Me bi destan demek berfê kola û hin darên hişk kom kirin. Dema em vegeriyan gel hevalan me dît ku ketine nav tirseke mezin. Gotine qey em di nav berfê de asê mane."

**'Tim dibû mînak'**

Adar Gulan di berdewama axaftina xwe de got: "Me di wan rojan de gelek caran agir vêdixist û li dora agir kom dibûn. Dema em kom dibûn çavên herkesî li heval Sara bû. Wê jî bêdudilî hemû pirsên ku jê dihatin pirsîn dibersivandin. Rojek dîsa dema em li dora agir kombûbûn heval Sara dîsa pirsên me yên der barê girtîgehê dê bibersivanda. Piştî pirsan sekinî û got 'erê ez ê ji we re behsa M. Hayrî Dûrmûş, Mazlûm Dogan, Kemal Pîr û hevalên din bikim. Lê xwezla niha ew li vir bûna û wan bixwe behsa wan rojan bikira.' Heval Sara li dîwana ku lê rûdinişt, bi kesayeta xwe ya zelal û xurt bandor li ser herkesî dikir. Ji ber vê bû ku herkes pê dişêwirî. Di rexne û rexnedayînê de pir wêrek bû. Enerjiya wê pir pozîtîf bû û di pratîka xwe de ji bo hevalan tim dibû mînak."

Adar Gulan got ku Sakîne Cansiz mijarên rojane ji dîrokê qût nedidît û wiha pê de çû: " Mijarên rojane bi dîrokê ve girêdida. Di kesayeta xwe de dîrokê dihewand. Tiştek ji bîr nedikir. Hewldana wê ya fêhmkirina Serokatî, têkoşîna wê ya bi paşverûtiyê re, sekna wê ya li hember mijaran ji ber ku tim zindî bû û di nav jiyanê de dihat dîtin ji bo me hemûyan dibû mînak. Wêrekiya wê ji bo min mezin bû. Min tim dixwest ku bi qasî wê wêrek bim. Ji ber ku ew bi kesayeta xwe herikbar bû hem di têkoşîna me ya niha de û hem jî di pêşeroja me de dijî. Em di mîrateya ku hiştiye de têkoşeriya wê, rêhevaltiya wê û rikbûna wê ya jiyanê dibînin."

**'Komplo plankirî bû'**

Adar Gulan komploya ku li dijî Sakîne Cansiz, Leyla Şaylemez û Fîdan Dogan pêk hatî wek komployeke plankirî nirxand û got: "Komploya ku li dijî hevalan pêk hat de hedef heval Sara bû. Di rastiyê de ev komplo di şexsê heval Sara de li dijî Tevgera Azadiyê pêk hat. Her wiha li dijî pêvajoya ku Serok Apo dixwest bide destpêkirin bertekek bû. Hem bi belgeyên ku hatin tomarkirin û hem jî axaftina rayedarên dewleta tirk aşkere bû ku ev komplo bi destê MÎTê pêk hatiye. Jixwe Omre Guney jî wek sîxurekî MÎTê hatibû perwerdekirin û piştî ku karê wî qediya hat kuştin. Rola Fransayê jî di vê komployê de heye. Ji ber vê yekê ji bo zelalkirina vê bûyerê ti tiştek nekirin. Fransayê dosyayê ji rojeva xwe derxist û niha dixwaze vê dosyayê ji bîra herkesî bibe. Fransa ji ber ku ne wek dosyayeke hiqûqî wek dosyayeke siyasî nêzî vê dosyayê dibe loma wisa tevgeriya."

Adar Gulan wiha dawî li axaftina xwe anî: "Fransa dosyayê ji rojevê derbixe jî em wek rêheval Sara, Rojbîn û Ronahî dê tim wan di têkoşîna xwe de bidin jiyîn."

# MAMOSTEYÊ ÇAPEMENIYA AZAD: Huseyîn Aykol

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, rojnameger Huseyîn Aykol bi bîr anî û got: "Kesayetek ji dil û kedkar bû. Şoreşgerek mînak û enternasyonalîst bû. Wê her dem di nav têkoşîna me de keda wî zindî bimîne."


Navenda Nûçeyan

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo Rojnameger Huseyîn Aykol diyar kir ji ber wefata Mamoste Huseyîn xemgîniya xwe anî ziman û sersaxî ji malbat, çapemeniya Azad, hevrêyê wî, hezkirî û hogiran re sersaxî xwest û got: "Daxwaza wî ya dawî ev bûyê ku bi min re hevpeyvînê bike. Ew daxwaza wî ji bo min bi nirx û watedar e. Bi mamoste Huseyîn re me di sêr salên 90î de derfeta hevdîtin û hevpeyvînê dîtibû. Heke ev mirina bêwext nebûna min dixwest wî bibînim û pê re sohbet bikim.

Ew kesayetekî enternasyonal bû ku jiyana xwe ji şoreş û têkoşînê re terxan kiribû. Kesayetekî ji dil û kedkar bû. Ev rewşenbîr û rojnamegerekî ku bûbû dengê heqîqete û şoreşgerekî ku şûna wî nayê tijekirinê ye. Me pêşengekî enternasyonalîst winda kir. Di hemû jiyana xwe ya têkoşer de bi pênûs û helwesta xwe her tim bû pêşengek, rê nîşan da û şoreşgerekî mînak e. Li cem min ew jî weke Gurbetellî Ersoz û Sirri Sureyya Onder hevalekî têkoşînê yê bêhempa bû. Jiyana wî nîşaneya şênber a lêgerîna heqîqetê û berpirsiyariya civakî ye. Li dijî tarîtiyê dengê heqîqetê bû û wî li ser rêya Çapameniya Azad qet serî netewand. Wî jiyana xwe fedayî azadiya gelan kir. Ditêkoşîna wekheviyê de kêliyek jî dilgiranî nekir û bi baweriyek xurt heta henaseya xwe ya dawiyê ve al ji destê xwe nedanî û tişta pêwîst bi laîqî bicih anî. Têkoşîn, îdeal û keda wî, wê di wîjdana vê axê de heta dawiyê zindî bê hiştin. Em ê bibin peyrew û şopdarên îdealên wî ku li paş xwe hişt, raman, têkoşîn û keda wî ya mezin. Em ê bîranîna wî di têkoşîna xwe de her zindî bihêlin û bidin jiyandin."

Rojnameger û nivîskar Huseyîn Aykol di 70 saliya xwe de li nexweşxaneya lê dihat dermankirin jiyana xwe ji dest da. Mamosteyê Çapemeniya Azad Huseyîn Aykol 51 salên xwe di nav xebatên mafên mirovan û çapemeniya azad de derbas kir. Ji ber xebatên xwe 12 salan di girtîgehan de hat ragirtin. Di salan 90î de dest bi xebatên çapemeniyê kir û heta dawiya emrê xwe berdewam kir. Huseyîn Aykol zêdetirî 36 salan mamostetî û kedkariya çapemeniya azad kir.

Huseyîn Aykol, sala 1955an, li gundê Poyrazdamlari yê Salîhlî ya Manîsayê hat dinê. Lîseyê li Îzmîrê xwend. Piştî lîseyê Fakulteya Tibê ya Zanîngeha Enqreyê qezenc kir û li wir xwendekarên çepgir nas kir. Di hilbijartinekê de bû serokê komeleya xwendekaran. Di sala 1978an de çend pirtûkên vî yên werger derketin.



**12 salên xwe li girtîgehê derbas kirin**

Sala 1981ê ji ber xebatên xwe hat binçavkirin û 45 rojan di bin çavan de ma û îşkence lê hat kirin. Ew şandin Girtîgeha Leşkerî ya Mamakê. Piştî hat berdan li Îzmîrê dîsa hat girtin, 6 sal û 8 meh ceza lê hat birîn. Di wê demê de gelek caran hat girtin û berdan. Bi giştî 12 salan girtî ma.

**36 salan şahidiya dîrokê kir**

Huseyîn Aykol piştî di salên 1990î de ji girtîgehê derket di rojnameya "Hedef" û "Halk Gercegî" de ku heftane dihat çapkirin xebitî. Piştî re di rojnameya Yenî Ulkeyê de dest bi xebatê kir. Di rojnameya Yenî Ulkeyê de karên cur bi cur kirin, bi salan gerînendetiya weşana giştî kir. Dema li Yenî Ulkeyê dixebitî bû şahidê bombekirina burayê. Cengîz Altun dema ku li Êlihê di 24ê sibata 1992yan hate kuştin. Piştî qetilkirina Cengîz Altûn, Huseyîn Aykol got: "Em rojnameger in û em ê karê xwe bikin. Em ê wisa bibin layiqê Cengîz." Paşê jî di rojnameya Ozgur Gundemê de xebatên xwe berdewam kir û 30yê gulana 1993yan di rojnemeya Ozgur Gundemê de xebatên cuda yên rojnameyê meşandin. Piştî ku 14ê nîsana 1994an Ozgur Gundem hat girtin, di rojnameyên Ozgurlukçu Demokrasî, Yenî Yaşamê de xebatên xwe domandin. Bi giştî 36 salên emrê xwe bi rojnamgeriyê derbas kirin.

**Ew deng û hawara girtîyan bû**

Yek ji karên ku herî zêde Huseyîn Aykol kelecan dikirin, nameyên girtiyên siyasî bû. Her roj girtiyên siyasî bi rêya nameyan pirsigirêkên xwe û zextên li girtîgehan ji Huseyîn Aykol re dinivîsandin. Her nameyê bi baldarî dixwend û di quncikê xwe yê rojnamayê de dinivîsand. Bi vê yekê dixwest bibe dengê girtiyên siyasî. Dema ku rojên name jê re nedihat xemgîn dibû. Lê dema name dihat bi kelecan nameyê dixwend. Li girtîgehan jê re pirtûkên girtiyan, helbest, bîranîn, wêne û peyamên şînê dihatin. Rojnameger Huseyîn Aykol van nameyan bi baldarî dişopand û yek bi yek nameyan dibersivandin.

**Ji her derê name jê re hatin**

Mamosteyê Çapemeniya Azad Huseyîn Aykol heya 14ê cotmehê 2025an bênavber xebatên xwe yên rojnamegeriyê domandin. 14ê cotmeha 2025an xwîn çû ser mejiyê Huseyîn Aykol ew rakirin nexweşxaneyê û 2 meh û 17 rojan li nexweşxaneyê li ber xwe da. Heval, dost, girtiyên siyasî û malbata Huseyîn Aykol, tevî ku ne li ser hemdê xwe bû sedan name, peyam jê re hatin şandin, daxwazên başbûn û hêviyên hevdîtinê jê re hatin xwestin.

**'Em ê bigihîjin azadiyê'**

Huseyîn Aykol herî dawî, 20ê îlona 2025an, bi boneya salvegera 33yemîn a qetilkirina Apê Mûsa wiha axivîbû: "Çapemeniya Azad îro rojname û kovaran çap dike, xwedî televîyon e û xîtabî tevahiya cîhanê dike. Me her sal bîlançoya girtin û kuştinan dianî ziman lê belê vê carê ez bi boneya mizgîniyekê hatim vê derê. Dibe ku te jî (Apê Mûsa) bihîstibe. Me agahiyeke baş anî. Îro gelê ku bi salan e şer dide meşandin, maseya aştiyê da avakirin. Tevî astengiyan jî heke ev mase neyê tunekirin em ê xwe bigihînin azadiyê, em bi hêvî ne. Me dixwest em bêjin ti hevalên me nehatin girtin û kuştin. Lê mixabin, îsal jî hevalên me yên hatine girtin û kuştin çêbûn. Bi awayekî hovane û bi tikandina dugmeyekê. Lê bila, ez bawer im em tên dawiya rê. Em ê bigihîjin azadiyê. Me heya niha ji ber şer nûçe çêdikirin lê em ê êdî nûçeyên azadiyê çêbikin. Hûn dizanin gelek qeyran hene. Ji kuştina jinan heya qirkirinên ekolojiyê gelek mijar hene. Tevî vanan zimanê medyaya hewizê jî heye. Werin em bi hev re atmosfera azadiyê ava bikin."

**77 rojan li ber xwe da**

Mamosteyê Çapemeniya Azad rojnameger û nivîskar Huseyîn Aykol, 14ê cotmehê, li mala xwe ya li Enqereyê, xwîn çûbû ser mejiyê wî û ew rakiribûn Nexweşxaneya Perwerde û Lêkolînê ya Sîncanê, saetên destpêka salê îro di 73 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe.

**Bû arşîva çapemeniyê**

Rojnameger û nivîskar Huseyîn Aykol, pirtûkên wekî "Ozgur Basın Tarihi" "Haber Basınından İslamcı Medyaya", "Aykırı Kadınlar: Osmanlı'dan Günümüze Devrimci Kadın Portreleri", "İlginç Zamanlarda Yaşamak" "Ayrılığın İçinden Geçerken", "Sol Örgütler Sağ ve İslamcı Örgütler", "Baskı Grupları: Bizi Kimler Yönetiyor?", "Modern Propaganda ve Modern Ajitasyon", "Refah Partisi'nin Tarihsel Gelişimi", "Gizli MİT'in Açık Tarihi", "CIA, Gladyo, Mafya Çete", "Ortadoğu Denkleminde Türkiye-İsrail İlişkileri" ve "Çerkes Ethem/Gerçek Yaşam Öyküsü" hatin çapkirin û gelek pirtûkên wî yên wergerê jî hene.

# IFJ: Di 2025an de 128 rojnamevan hatine kuştin

Navenda Nûçeyan

Federasyona Navneteweyî ya Rojnamevanan (IFJ) ragihand ku sala 2025an, 128 rojnamevan li seranserê cîhanê hatine kuştin û zêdetirî nîvê wan li Rojhilata Navîn in. Federasyonê diyar kir ku ev hejmar li gorî ya par zêde ye. Sekreterê giştî yê IFJê Anthony Bellanger ji AFPê re got, ev hejmar "hişyariyek sor a gerdûnî" ye û anî ziman ku hedefgirtina rojnamevanan a zêde nîşan dide ku hawirdora xebatên rojnamegeriyê xetere ye.

Anthony Bellanger fikarên xwe ji ber rewşa li Filistînê nîşan da û da zanîn ku li Filistînê di salekê tenê de 56 rojnamevan hatine kuştin.

Anthony Bellanger bêcezatiya berdewam şermezar kir û hişyarî da ku nebûna edaletê dubarebûna sûcên li dijî rojnamevanan teşwîq dike. Federasyonê destnîşan kir ku li seranserê cîhanê 533 rojnamvan girtî ne, ji çaryeka wan zêdetir li Çîn û Hong Kongê ne.

Rojnamevanên Bêsînor hejmara kuştiyan jî diyar kir ku sala 2025an, 67 rojnamevanan hatine kuştin û Rêxistina Neteweyên Yekgirtî ya Perwerdehî, Zanist û Çandê (UNESCO) daxuyand ku di heman salê de 93 rojnamevan hatine kuştin.

Îranê hezar û 500 mirov darve kirin

Li gorî daneyên rêxistina civakî ya bi navê Mafên Mirovan a Îranê (Iran Human Rights-IHR), li Îranê di tevahiya sala 2025an de, hezar û 500 kes hatine darvekirin. Dîrektorê IHRê Mehmûd Emîrî Muxedam ku navenda saziyê li Norweçê ye, daxuyaniyek da AFPê û got: "Tişta ku em bi awayekî teqez dizanin ew e ku hejmara darvekirinan ji hezar û 500î derbas bûye. Ev rekorek e. Ji dawiya salên 1980yî vir ve, zêdetirî 35 sal, hejmara herî bilind ev e."

Mehmûd Emîrî her wiha diyar kir ku hê jî bi sedan bûyerên darvekirinê hene ku nehatine piştraskirin û anî ziman ku dibe hejmara rastîn gelekî ji ya hatî aşkerekirin zêdetir be.

## Di salekê de 241 DAIŞî hatin girtin

Navenda Nûçeyan

Di salên dawî de Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Bakur û Rojhilatê Suriyeyê (Rojava), li hemberî êriş, torên sûcên civakî, bazirganên madeyên hişbir, şideta li hemberî jinan, kuştin, dizî û talankirinê bi sedan operasyon li dar xistin. Di operasyonan de bi hezaran kes hatin girtin, gelek çek û cebilxane hatin desteserkirin. Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bîlançoya 2025an aşkere kir. Li gorî raporê:

Di 2025an de bi koalîsyona navneteweyî re 40 operasyonên hevbeş hatin lidarxistin. 43 şaneyên veşarî hatin dîtin. Di van şaneyan de 23 şaneyên rêxistina DAIŞê hatin bidestxistin. 57 teqemenî hatin hatin îmhakirin. Di van operasyonan de, 241 kes hatin girtin û di vê pêvajoyê de 177 teqîn çêbûn.

Di operasyonên hevpar ên salekê de; 15 keleşnîkof, 10 demançe, dengbirek û 2 heb diron, 1 BKC û 4 wesayît hatin bidestxistin. Dîsa di salekê de Hêzên Antî Terorê (H.A.T) li herêmê 146 caran bi ser navnîşanan de girtin. Di van serdegirtinan de 320 kes hatin girtin.

HATê di serdegirtina malan de gelek cebilxane bi dest xistin. HATê di operasyona salekê de 136 keleşnîkof, 46 demançe, 48 tifingên nêçîrê, 571 çekên cur bi cur, 7 BKC, 64 bombeyên destan, 2 dûrbîn, 2 guleyên roketan, 464 guleyên 5.5, 11 hezar û 200 guleyên keleşnîkofan, 474 guleyên demançeyan, 2 hezar û 902 guleyên BKCyan, 39 teqemenî û roketan û bi hezaran guleyên çekên cuda hatin desteserkirin.

Di van operasyonan de ji ber sûcên kuştin û sûcên li dijî civakê de, 327 bûyerên tiryakê pêk hatin. Di van bûyeran de bi giştî 4 hezar û 334 kes hatin girtin.



**Şerê HSDê yê li dijî DAIŞê**

Navenda Ragihandinê ya HSDê jî bi daxuyaniyekê bîlançoya sala 2025an a operasyonên ewlehî û leşkerî yên li dijî çeteyên DAIŞê weşand. Di encama operasyonên HSD û Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ) de bi dehan kesên ku tev li çalakiyên terorî bûne hatin girtin û bêbandorkirin. HSDê destnîşan kir, tevî ku DAIŞ hatiye lawazkirin, hîn jî metirsiya wê heye û hewl dide ji talûkeya ewlehiyê feydê bibîne û aramiyê têk bibe. Li gorî daxuyaniyê, amar wiha ne: 163 operasyonên ewlehî û leşkerî, 3 operasyonên lêgerînê yên berfireh, 128 operasyonên biserdegirtinê, 28 operasyon û şerê li dijî DAIŞê pêk hatin. Bi giştî di van operasyonan de 140 endamên DAIŞê hatin girtin. Dîsa di salekê de DAIŞê 220 êrîş pêk anîn

**9 hezar û 200 kes hatin kuştin**

Bîlançoya qurbaniyên tundî û qetilkirinê li Sûriyeyê di 2025an de, 9 hezar û 200 kesî derbas kir. Di 2025an de zêdetirî 9 hezar û 200 kes hatin kuştin. Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyeyê (SOHR) bîlançoya 2025an a kiryarên tundî, sûc û qetilkirinên bi ajoyên mezhebî û tolhildanê parve kir.

## DÎROKA RASTIYA FELSEFEYA SOSYALÎZMÊ

# Kirde modernetiya demokratîk e

■ Xecê Şen

*Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, 27ê sibatê 2025an, banga Aştî û Civaka Demokratîk kir. Piştre jî Manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk amade kir û bi rêya heyeta Îmraliyê ji hemû sazî, partî û tevgerên jinan re şand. Rêberê Gelê kurd Abdullah Ocalan, di manîfetoyê de li ser gelek xalên girîng ên wek pergala dewletî, li dijî pergala dewletî wek alternatîf yekîneyên komunan, sosyalîzma reel, fikrên Marks û marksîzmê rawestiya û li gor ruhê vê serdemê nûjeniyek a li ser esasê rastiya sosyalîzmê da ava kir û wek sosyalîzma demokratîk pênase kir. Xalên ku di manîfestoya demokratîk de li ser sosyalîzma klasîk destnîşan kir, di konferansa navneteweyî de ku li Stebolê pêk hat, bû mijara marksîstên li Tirkiyeyê.*

*Em der barê konferansa Navneteweyî, li ser fikrên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ên nûjenkirina sosyalîzmê, sosyalîzma reel û marksîzmê bi nivîskar û siyasetmedar Alî Haydar Elyakût re axivîn ku ew 32an salan di zindanê de maye.*



Nivîskar û siyasetmedar Elyakut diyar kir ku divê di her qadên jiyanê de li dijî kujerê kastîk têkoşin û komunan ava bikin û got: “Li gorî rastiya felsefeya diroka Moderniteya Demokratîk kirdeya sosyalîzmê derveyî şaristaniya kapîtalîst e.”

***Peyama Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a ku ji konferansê re şandibû, mijara sosyalîzmê bala herkesî kişandibû ser xwe. Ev yek li nav marksîstên Tirkiyeyê rê li ber nîqaşên nû vekir. Hûn van nîqaşan çawa dinirxînin?***

Nêrînên Rêber Apo, ku di konferansa Navneteweyî de hatin xwendin, rastî eleqeyeke gelekî mezin hatin. Nêrîn, rexne û nirxandinên Rêbertî ne tenê li nav marksistên Tirkiyeyê, ji wê zêdetir li nav rewşenbîr û marksîstên cîhanê jî tên şopandin û nîqaşkirin.

Demeke dirêj e li nav çepgiran, li ser kêmasiyên teoriyê, taktîk û stratejiyên wê, nîqaş û rexne curbicur tên kirin. Çimkî heqîqet li ber çavê herkesî ye. Heqîqet jî ev e ku, sosyalîzma reel ku bingeha teorî û pratîka xwe ji marksîzmê digire, ji pirsgirîkên civakan re nebû bersiv. Bi fedekariyên bêhempa yên şoreş û şoreşgeran jî moderniteya kapîtalîst hilneweşiya. Jixwe bi hilweşandina sosyalîzma reel re, kapîtalîstan bi devê Fukuyama kapîtalîzm weka ‘pergala dawî’ destnîşan kir. Ango nîqaşên der barê kapîalîzmê de êdî ne nîqaşên akademîk û razber in. Ev têkildarî pêşeroja mirovahiyê ne. Gelo civaka dîrokî dê bikaribe hebûna xwe biparêze yan jî li hemberî tiştên xetertir bigindire û veguhere tişteke dîtir. Çimkî zanîna heyî, pêşketinên der barê fizîk, kîmya, biyolojî, hişê çêkerî li gel derfetên mezin, rê li ber metirsiyên mezin jî vedike. Ji aliyekî ve em der barê pirsgirêkên anakronîk diaxivin her wekî hê jî di şert û mercên du sed sal berê dijîn de tevdigerin. Bi pêşketina teknolojiya mêjiyê çêkerî re hemû teoriyên sedsalên berê bandora xwe wenda kirin. Îro kes nikare pêşeroja civakê texmîn bike. Gelo ev teknolojî û zanîna di serdema me de dê rê li ber demokrasî û refahê vebike yan jî dê bibe sedema tekno-serdestiyê û kendala serdestan û bindestan teqeztir bike? Di nav çepên tirk de jî bi qasî ku dişopînim nîqaşekê dest pê kiriye. Lê belê mirov dema dêna xwe dide wan nirxandin û nîqaşan, baştir rewşa wan a heyî û sedema marjînalîzebûna wan fêhm dike. Bi awayekî jixwebawer tiştên ku du sed sal berê şaşiya wan di pratîkê de hatiye peyitandin, wek benîşt dicûn û êriş dikin. Rewşa tevger û teoriyên marjînalîzebûna wan jî wisa ye: di nav qalikên xwe de çilmisîne û ji heqîqetê qut bûne.

***Hûn jiyana sosyalîzmê ya serdema niha û nûjeniya wê çawa dibînin?***

Yek rexneya herî girîng a Rêber Apo li marksîzma heyî, sosyalîzma reel aniye, şîroveya der barê diyarkirina mijara ‘‘pirsgirêk’’ê ye. Marks wek pirsgirêka bingehîn nakokiya çîna karker û bûrjûvaziyê diyar kir. Lewra jî mîsyona avakirin û damezirîna civaka sosyalîst da çîna proleter. Helbet dema ku pirsgirêk şaş hat danîn rê, rêbaz û nexşerêya sosyalîzmê ji şaş hatin sazkirin. Hegel dewleta monarşîk a alman wek armanca nîhayî ya mirovahiyê nîşan dabû. Li gorî wî takekes di nav dewletê de bigihîşta azadiyê. Marks û Engels jî rabûn û di nav netewe-dewletê de desthilatdariya proleteryayê wek armanca dawî diyar kir. Her wek Rêber Apo dibêje “Netewe-dewlet koletiya herî kûr û giran e’’. Lê belê Rêbertî wek pirsgirêka civakî ya bingehîn teoriya çînayetiyê napejirîne. Li gorî paradîgmaya wî, problema civakî ya bingehîn nakokiya di navbera mêr û jinê de ye. Di berdewama vê jî de tekoşîna herî bingehîn, têkoşîna komun û dewletan e.

Ev nirxandineke nû nîne û ji aliyê Rêber Apo ve bi dorfirehî û bandorker hatiye teorîzekirin. Yek ji rexneyên herî girîng a Rêber Apo ku li marksîzmê dike, mijara moderniteya kapîtalîst e. Marks ji xeynî kapîtalîzmê, her du mijara moderniteya kapîtalîst ango netewe-dewlet û endustriyalîzmê wek pirsgirêk nedîtiye. Teoriya xwe daniye ser rexneyên kapîtalîzm û sosyalîzmê û bi nirxandinên kapîtalîzmê ve bi sînor kiriye. Lê belê Rêbertî nirxandinên Marks ên der barê kapîtalîzmê de jî kêm û şaş dibîne. Li gorî Marks û Engels civaka kapîtalîst civaka herî pêşketî bû û sosyalîzm dê li ser kapîtalîzma pêşketî bihata damezirandin. Berovajî Marks, Rêber Apo têgiha ‘‘civaka kapîtalîst’’ napejirîne û di vê babetê de Marks û Engels rexne dike. Lê belê Marks çawa ku nirxeke neheq daye kapîtalîzmê, pê re jî du siwarên dîtir ên ji sê siwarên mahşerê nekiriye mijara rexne û nirxandinên xwe. Li gor Marks û Engels heke avahiya maddî ango ekonomî bihata guhertin wê pê re ji hemû avahî biguheriya. Lê wisa nebû. Bandora wateyê kêm hesiband. Di vê mijarê de A. Gramscî, di zindanê de gelek nirxandinên giranbûha bi pêş xistin. Gramscî guhertina kapîtalîzmê bi tena serê xwe têr nedît û têgiha ‘hegemonyaya bîrdoziyê’ bi pêş xist. Çimkî çîna proleter koleyên dema pergala kapîtalîzmê ne. Koleyan jî ti carê şoreşek pêk neaniye û nayne jî. Çimkî ew ji parçeyê pergala desthilatdariyê ne. Çawa ku dewletên Sumer, Misir û Romayê bê kole nikarîbûn hebûna xwe bidomînin, kapîtalîzm jî nikare bê piştgiriya proleteryayê hebûna xwe bidomîne. Ev rastiyek e. Lewra Rêber Apo di encama nirxandinên felsefeya xwe ya dîrokê de mîsyona pêşengiya proleteryayê red kir. Li gorî felsefeya dîroka moderniteya demokratîk kirdeyên sosyalîzmê, derdorên derveyî şaristaniya kapîtalîst in.

***Çi cudahî di navbera diyalektîka marksîzm û ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de heye?***

Rêbaza sosyalîzma heyî rêbaza diyalektîk e. Bi rastî Rêbertî rêbaza diyalektîkê red nake. Lê belê bikaranîna wê rexne dike. Çimkî li gorî diyalektîkê du alî divên. Du aliyên dijber. Ango nakokiya antagonîstîk e. Lê belê diyalektîka Marks û Engels rûxîner e. Rast e tê gotin ku têkoşîna du dijberiyan rê li ber xala sêyemîn vedike. Sentez çendîn ku li ser bingeha dijberiya tez, antî-tezê ava dibe jî, li ser tunekirinê bi pêş dikeve. Di xweza û civakê de têkiliya sîbiyotîk heye. Diyalektîka ku Rêbertî bi kar tîne afirîner û avakar e. Ev diyalektîka ku marksîzm esas digire, bingeha xwe ji zanista determînîst digire. Ango tiştekî yan rast e, yan şaş e. Lê belê bi fîzîka kûantumê re zagonên cuda peyda bûn. Ligel ku li hinek qadan fîzîka determînîstîk derbasdar e jî fîzîka kûantumê nêrîna me ji binî ve guhert û teşeyeke nû dayê.

***Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di peyama xwe de anî ziman: “Ez marksîzmê ji marks cuda dibînim.” Ev tê çi wateyê?***

Ev nirxandin gelek di cih de ye. Ligel hemû şaşiyên wî jî, Marks teorîsyenekî serdema xwe bû. Marks hemû jiyana xwe da azadî û rizgariya bindestan. Şaşiyên teoriya wî bi ti awayî ziyanê nade ked, xebat û dilsoziya wî ya sosyalîzmê. Armanca teoriya wî azadiya bindestan bû. Ji ber vê armancê ket nav lêkolînê û teoriyek danî holê. Tişta ku hatiye serê Marks hatiye serê hemû pêxemberan. Peywirên wan piştî demekê pergal û ramanên wan veguherandine tişteke dîtir. Heke ew îro vegeriyana serdema niha dê pergala xwe nas nekirana. Di romana Dostoyevskî, Birayên Karamazov de beşa engîzîtorê mezin heye. Li wir Îsa careke din dadikeve cîhanê û dikeve nav bindestan. Ji wan re careke din dibe hêvî. Lê belê engîzîtorê ku li ser navê Îsa tevdigere wî digire û dibêje; ‘’Heke tu vê cîhanê terk nekî, ez ê te jî bişewitînim.’’ Meseleya Marks jî bi heman rengî ye.

***Di sosyalîzmê de yek ji mijarên herî girîng, azadiya jinê ye. Hûn li ser ve mijarê çi difikirin?***


Dema destpêka têkoşîna sosyalîzma nûdem, pirsgirêka zayendî û azadiya jinê zêde nebûye mijara lêhûrbûna Marks û Engels. Tevgerên anarşîst jî bi heman rengî tevgeriyane û bi vê pirsgirîkê ve serê xwe neêşandine. Teoriya marksîzmê zelal e: nakokiya antagonîst, nakokiya di navbera çîna proleter û bûrjûvaziyê de ye. Heke ev nakokî were çareserkirin dê hemû pirsgirîkên din jî çareser bibin! Piştre jî dê azadiya jinê were çareserkirin. Nirxandin û rexneya herî tund a Rêber Apo di vê mijarê de ye. Cudatiya di navbera marksîzma klasîk û nirxandina Rêber Apo de ji ber encama nêzîkatiya wan a der barê felsefeya dîrokê ye. Rêbertî dibêje nakokiya yekemîn a civakê nakokiya di navbera jin û mêran de ye. Bi kinasî jin klanê ava dike, civak li dora jinê şênber dibe paşê mêr ango bi têgiha Rêbertiyê em bêjin kujerê kastîk dikeve nav tevgerê û li dijî jina afrîner, kasta pîroz ava dike û ev dijberî herî dawî digihîje dewletê. Her wiha pirsgirîka azadiya jinê û civaka komunal derdikeve. Ango problema civakê bi êriş û rêxistinbûna kujerê kastîk derdikeve holê. Her wisa keşfa Rêber Apo ye. Li gorî Rêbertiyê azadî piştî şoreşê nabe, lê azadî bi demê re di nav kêliya tekoşînê de tê afirandin. Azadiya civakê girêdayî azadiya jinê ye, helbet dema Marks û Engels der barê dîrokê evqas pêşketin û zanîn tunebûn. Ji ber vê rastiyê jî Rêbertî di vê mijarê de çendîn ku rêbaza wan a dîrokê rexne dike jî, mafê Marks û Engels dide wan û hewldana wan a der barê heqîqetê teslîm dike. Lê belê arkeolojiya li Mezopotamyayê nemaze keşfên li Kurdistanê, dîroka ku di dema Marks û Engels ji binî ve guherand û teşeyeke nû danê. Bi awayekî zelal hat fêhmkirin ku afirînera civakê û hemû mirovbûnê jin e. Hema hemû nirx, sinc, amûrên hilberîn, civakbûn ji hêla çîna jinê ve hatine afirandin. Ango civak bixwe jin e û civaka sincî û polîtîk berhema jinan bixwe ye. Rêber Apo ji mêrê kompiloger re dibêje kujerê kastîk. Li dijî jinan komên veşarî û pîroz damezrandin. Jin jî ji ber vê yekê hewldana kujerê kastîk dikeve nav xweparastinê û nahêle mêr hêza xwe mezin bike. Bi wê re jî çîn, mijokdarî, koledarî, dewlet û xanedanî tên avakirin. Ji ber vê yekê azadiya jinan di heman demê de wek azadiya civakê jî tê pênasekirin.

***Feylesof û rewşenbîrên ku xwedî xelata Nobelê ne tev li Konferansa Aştî û Civaka Demokratîk a Navneteweyî bûn. Hûn vê çawa dinirxînin?***

Nêrînên Rêber Apo bandoreke mezin li ser tekoşîna bindestan dike. Gelek derdor îlhamê jê wewrdigirin. Jixwe siyasetmedar, rewşenbîr û feylesofên ku ji çar aliyên cîhanê tev li konferansê bûn jî ev rastî anî ziman. Çimkî li çar aliyên cîhanê demeke dirêj e hegemonyaya moderniteya kapîtalîst serwer e û çepgir nikarin vê hegemonyayê parçe bikin. Piştî demeke dirêj Rêber Apo nexşerê û teoriyeke bibandor û li gorî heqîqetê pêşkêş kir. Derfetên nû li ber tekoşîna bindestan û yên din vekir. Heke ev nêrîn baş were pêşkêşkirin dibe ku rê li ber enternasyonaleke nû vebibe.

***Civaka demokratîk a komunal dê çawa were avakirin?***

Yek ji mijarên herî girîng ên konferansê jî ev bû. Rêber Apo berê jî herî zêde li ser civaka demokratîk û komunê radiwestiya. Civak bi hezar salan e ku bi rêya komunalîteyan xwe li dijî pergala kujerê kastîk li ber xwe daye û parastiye. Tevî ku gelek pirsgirêk hene û gelek aliyên wê hatine rizandin. Civak sincî û polîtîk e. Divê ew puxteya demokratîk û komunal were zindîkirin û li hemû qadên civakê komun werin avakirin. Divê li her qadên jiyanê li dijî kujerê kastîk têbikoşin û ji kolanan û heta taxan komunên xwe ava bikin. Çimkî tekane alternatîfa kapîtalîzma mijokdar pergala komunê ye.



### Alî Haydar Elyakut kî ye?


Sala 1976an li Amedê ji dayik bû. Dema xwendina xwe ji ber kar û xebatên şoreşgerî hat girtin. Li DGMê hat darizandin û cezayê hetahetayê wergirt. Li girtîgehê li ser siyaset û felsefeyê xebitî. Pirtûkên wî ji ber bêderfetiyên zindanê nehatin çapkirin. Piştî 32 salan ji zindanê derket.

# Elmo Begarî, wêjeya zîndanê û çîroka kurdî

**Pirtûka "Beqê Xayîn" ji 15 çîrokan pêk tê ku her yek ji wan xwendevanan dibe nava qadên cihê yên jiyana kurdan; ji gundên Kurdistanê bigire heta zîndanên tarî û çiyayên azadiyê. Nivîskar di pirtûkê de li ser 3 mijaran radiweste**



Hogir Berbir




Elmo Begarî, nivîskarekî ku bi 30 salên xwe yên di girtîgehan de, bi pirtûka xwe ya duyemîn, "Beqê Xayîn", careke din berê xwendevanên wêjeya kurdî daye berhemên zîndanan. Ev pirtûk, ku di sala 2023yan de ji aliyê weşanxaneya J&J ve hatiye weşandin û 80 rûpel e, bi zimanekî şêrîn, xwezayî û têker, xwendevanan dibe nav cîhaneke ku tê de rastiya jiyana kurdan, hestên kûr û serpêhatiyên biêş bihostatî hatine hûnandin. Min ev pirtûk di çend seatan de xwend û qedand; çîrokên wê yek bi yek wekî çemekî diherikin, mirov ji xwendinê naşopîne û bi her rûpelekê re bêtir di nav cîhana wê de wenda dibe.

**Jiyana Elmo Begarî**

Elmo Begarî, sala 1973yan, li gundê Fêzikê yê Dêrika Çiyayê Mazî, li herêma Metînan a Mêrdînê, hatiye dinê. Sala 1994'an, dema ku li Zanîngeha Dîjleyê dixwîne, ji ber xebatên xwe yên siyasî hatiye girtin û ji wê demê ve hîn di zindanê de ye. Ev ê rewşa dijwar wî têk biriye û kiriye xwediyê wêjeyeke bihêz û kûr. Berî "Beqê Xayin", pirtûka wî ya yekemîn "Mizgîna Dizan" sala 2013an ji aliyê weşanxaneya Avestayê ve hatibû weşandin ku ew jî di wêjeya zindanê de cihekî girîng digire.

Navê "Elmo Begarî" bixwe jî balkêş e. Ev nav ku li xwe kiriye, di nav wêjeya kurdî de cihekî taybet digire û wekî semboleke nû tê dîtin. Ev nav, bi çîrokên xwe re, dibe parçeyek ji çanda wêjeyî ya kurdî û bi xwe re nûbûnekê tîne.

**Naveroka pirtûkê, 15 çîrokên dilêş**

Pirtûka "Beqê Xayîn" ji 15 çîrokan pêk tê ku her yek ji wan bi awayekî cuda xwendevanan dibe nav qadên cihê yên jiyana kurdan; ji gundên Kurdistanê bigire heta zindanên tarî û çiyayên azadiyê. Çîrokên bi navên "Kurdî Qedexe Ye", "Heval", "Beqê Xayin", "Ez jî ji Xirbêbelek im", "Mewlûd", "Poşmanî", "Tol", "Masî", "Radyo", "Sofiyê Kone", "Kevirbir", "Gundê Bêdiranan", "Fabrîqa Kereste", "Bizina Gerîla" û "Şanazî" di vê pirtûkê de cih digirin. Her çîrok bi zimanekî zelal, dewlemend û bi hêz hatiye nivîsandin ku ne tenê ji hêla naverokê ve, lê ji hêla estetîka zimanî ve jî bandorê li mirov dike. Çîroka navdar a "Beqê Xayin" ku navê xwe daye pirtûkê, di pêşbaziya wêjeyî ya Hûseyîn Çelebî de bûye duyemîn û bi xwe re hem kûrahiya civakî hem jî hêza wêjeyî tîne.

Naveroka çîrokan bi giranî li ser sê qadan disekine; jiyana civakî, serpêhatiyên zindanê û têkoşîna gerîlayan. Ev çîrok, bi awayekî xwezayî û bi hostatî, wêneyên rastiya civaka kurdî radixin ber çavan. Ji qedexekirina zimanê kurdî bigire heta têkoşîna li çiyayan, ji êşên zindanê bigire heta henek û laqirdiyên jiyanî, Begarî bi zimanekî ku hem şêrîn e hem jî têker, xwendevanan dibe nav cîhaneke ku tê de her rêza çîrokên jiyanê bixwe ye. Çîrokên wî ne tenê vegotin in, lê di heman demê de dîmenên zindî ne ku mirov dikare wan bibîne, bibihîze û hest bike.

**Wêjeyeke xwedî ruh û şêwaza nivîsê**

Yek ji taybetmendiyên herî berbiçav ên pirtûka "Beqê Xayin" zimanê wê yê zindî û xwezayî ye. Begarî bi zimanekî ku hem bi ramanên kûr dagirtî ye hem jî bi henek û laqirdiyên jiyanî xemilandî ye, rasterast dest pê dike û çîrokên xwe vedibêje. Zimanê wî ne tenê amûrek e ji bo vegotinê, di heman demê de navgînek e ku hest, êş, hêvî û têkoşîna kurdan bi awayekî rastîn radigihîne. Piraniya çîrokan li Kurdistanê derbas dibin, carinan xwendevanan dibe metrepolên Tirkiyeyê, lê her gav bi koka xwe ya kurdî ve girêdayî dimînin.

Tevî ku çîrok bi zimanê duyemîn hatine nivîsandin, lê zimanê Begarî ew qas bi hêz û xweş e ku mirov nikare vê yekê hîs bike. Her çîrok, bi awayekî, ji serpêhatiyên rastîn hatiye dagirtin û ev yek ku hê bêhtir nêzî dilê xwendevanan bibe. Mirov di her çîrokê de xwe wekî parçeyek ji wan bûyeran dibîne, ji ber ku ew ne tenê çîrok in, dîroka jiyana kurdan a rasteqîn û hebûnî ne.

**Pirtûkeke ku dîwaran hildiweşîne**

Wêjeya zindanê di nav wêjeya kurdî de xwedî cihekî taybet e û Elmo Begarî bi "Beqê Xayin" vê kevneşopiyê berdewam û dewlemendtir dike. Çîrokên wî ne tenê serpêhatiyên kesayetiyên takekesî ne, di heman demê de vegotineke gelemperî ya biêş, berxwedan û hêviya gelê kurd e. Di nav dîwarên zindanê de ku bi azadî fikirandin, bi pênûsa Begarî re dîwaran hildiweşîne û wêjeyê diafirîne.

Her wiha "Beqê Xayin" ne tenê pirtûkeke çîrokan e, di heman demê de rastiyek e ku tê de çanda kurdî, têkoşîn û ruhê wê bi awayekî bêhempa têne vegotin. Elmo Begarî, bi vê berhema xwe, careke din îspat dike ku wêje, di rewşên herî dijwar de jî, dikare bibe ronahiyeke ku rêya mirovan ronî dike. Bi zimanê xwe yê dewlemend, naveroka xwe ya kûr û şêwaza xwe ya herikbar, ji bo her xwendevanekî wêjeya kurdî berhemeke bêhempa ye.

Bo wê dibêjim; bixwînin û bi çîrokên Elmo Begarî re, li nav cîhana rastiya kurdan bigerin.



Elîxan Loran

# Xweavakirin



Rexnegirê amerîkî Harold Bloom ê ku têgehên wekî 'endîşeya bandorstendinê' 'şaşxwendinê diyarî cîhana wêjeyê kiriye û li ser 'divê mirov çima û çawa bixwîne' sekiniye, dibêje "qebûlkirina hêza estetîk fêrî me dike ku em ê bi xwe re çawa biaxivin û em ê çawa tehemulî xwe bikin." Ji ber ku li gorî wî sûda rast a nivîskarên mezin ên cîhana wêjeyê ev e ku, wan nivîskaran tevkarî li mezinbûna kakilê kesayetiya mirovan kiriye.

Li vir ji gotin û fikrên Bloom zêdetir dixwazim balê bikişînim ser gotinên wî yên 'axaftina bi xwe re', 'hêza estetîkê û xweavakirinê'. Di vê çarçoveyê de dixwazim gotina xwe ya dawîn di serî de bibêjim: Ez ji bo hînî kurdî bibim, helbestê dinivîsim!

Ji ber ku kurdî [kurmancî] û civaka kurd di du sed salên dawîn de derbên giran xwarine, wekî çemekî ku pêşiya wê hatibe girtin, ji neçarî berê xwe guherandiye, ji xwe re rêyek dîtiye. Lê ev rê li gorî şertên zor û zehmet stratejîk be jî, li gorî geşbûna organîk a li ser axa xwe û bi civaka xwe, ji stratejîkbûnê wêdetir mecbûriyet e. Dema rojnameya Kurdistanê li Misirê, kovara Rojî Kurd li Stenbolê û kovara Hawarê li Şamê hatin derxistin, li gorî şertên wê demê ev gavên stratejîk bûn lê ji bo geşbûna kovargerî, rojnamegerî û wêjeya kurdî ev mecbûriyetek bû ku li 'dûr'ahiyê 'nêzîk'an nêzîktir bike.

Li vir tişta nêzîk, liberdest, potansiyel û çavkanî Kurdistan bû lê ji neçarî hevîrê wêje û ziman, ji dêvla deştên Kurdistanê wê di teştên xerîbistanê de bihata strandin, ev hevîr ji dêvla volkanên wekî Qerejdax, Tendûrek û Agiriyê wê di tenûrên Misir, Stenbol û Şamê de bihata xistin. Ev kovarên kurdî heke kilama qedîm û pirtûkên pîroz bûna jî, rê li ber wan hatibû girtin ku di nav civaka xwe de geş û belav bibin. Di dîrokê de ji tu peyamberên li dûrî axa xwe, yên li sirgûnî û xerîbiyê 'pirtûk nehatine şandin' û 'pê re nehatiye axaftin'. Ev krîza ku hatiye serê kurdan nehatiye serê tu gel, netewe û komên baweriyên din.

Ligel ku dîrok bi hejmarî bi pêş ve diçe, dîrokê yan bermahiyeke biçûk ji gel û zimanan re kiriye sermayeyeke mezin an jî ji sermayeke mezin çend bermahî, qir û qaf hiştiye. Para me kurdan jî bûye bermahiyên parçebûyî. Ji ber ku divê em li ser van bermahiyên parçebûyî yên di dema xwe de li dûrahiyê hatiye avakirin, ji nû avakirinekê bikin, karê me du katan zêdetir dibe. Ji ber ku dema em bixwazin qala hêza estetîkê bikin jî divê em dîrok û civaka xwe ya bûye serad, ji nû ve bişon û veşon, piştre bi saz û awaz bikin.

Ji bo qebûlkirina hêza estetîkê ji me re 'xwe'yek hewce ye, lê ew 'xwe'ya me di bin kavilên dîrokê de, di bin xweliyên civaka şewitî de maye. Me 'xwe'stiye em ji dûrahiyan hinek 'xwe'yan ava bikin ku ev 'xwe' bibin haveyn, rol û modela em li dûrî wê ne, ev jî toqeke naletê ye ku dîrok xistiye stûyê me.

Ev reaksiyonên ku di dîroka me de pêk hatine, li ser wêjeya me jî dibe wekî nifireke kolektîf (hûn ê her dem ji hev dûr û parçe bin, yekparetî û yekîtî wê nebe para we), pizikeke genetîk (wê qedera we her dem wisa be ku hûn ê xwe bi xwe bin, hûn ê hevdu ji pizikên hev nas bikin) an jî sînorekî ku di hişê me de hatiye çêkirin (aso wê ji we re sînor be, hûn biçin ber asoyê jî hûn ê nikaribin wî sînorî derbas bikin.)

Dema dibêjim 'Ji bo hînî kurdî bibim, helbestê dinivîsim!' qala van reaksîyonên di dîrokê de dikim, ez 'xwe bi xwe' 'xwe' dikim 'xwe' da ku 'xwe'yê pêşkêş bikim. Ji bo pêşkêşkirina helbest û estetîkê, 'xwe'yek hewce ye ku mirov pê re biaxive û tehemulî wê bike.

Li vir çiqasî tehemulî 'xwe' dikim ew qasî 'xwe'yekê ava dikim ku pê re biaxivim û çiqasî 'xwe'yan zêde dikim da ku pê re biaxivim ewqasî jî tehemulî hebûn û zêdebûna wan dikim.

Estetîka di vir de wekî erdhejê ye. Lewheya 'axaftina bi xwe re' û lewheya 'tehamulkirina xwe' dema li hev dikevin û erdhej çêdibe, ji vê erdhejê germav (fikr û ramyarî) avên xwedî mîneralên zêdê (huner û estetîk) dizên. Gelê kurd li ber şarampol û karambolan, hewl daye çirûskek be jî ava bike û ji bo hişyarî û ronahiyeke mezintir, hewl daye wê çirûskê bike birûsk.

Xweavakirin dibe jengayeke ku her carê parçeyekî ji nava xwe derdixe û datîne ser xwe û hewl dide wisa bilindtir bibe, valabûna di nav wê de ji wê re krîz be jî, ew valabûna di nav xwe de ji xwe re dike barsivikî û wisa bilind dibe.


Ji bo ku qayîşê bi kûleyên mezin bikişîne, divê ew kêmasî û valabûna di nav xwe de, ji xwe re bike haveyn û wisa bilindtir bibe.

# Rapora MHPê û înkara sozên Mustafa Kemal

Eger MHP di vê pêvajoyê de mafên kurdan ên xwebirêvebirinê yên çand û zimanî nas neke, van mafan neke nav hiqûqê, ew ê bi kurdan re bi kîjan rêyê jiyana hevpar û welatek aram, demokratîk û hevpar damezirîne gelo?



Cahîd Kirkazak



Di ser pêvajoya aştî û demokrasiyê de 15 meh derbas bûn. Bi taybetî ji peyama birêz Ocalan a 27ê sibata 2025an vir ve gelek gavên şênber û girîng hatin avêtin. Yek ji van gavan jî li meclisê damezirandina Lijneya Piştgiriya Neteweyî, Xwişk-Biratî û Demokrasiyê bû. Ev lijne heta ku hat damezrandin gelek nîqaş hatin kirin. Lê licihbûna pêşniyariya Ocalan, geşedanên pêvajoyê û bi israra Bahçelî, lijne 5ê tebaxa 2025an bi pêşengiya Numan Kurtulmuş re hat damezrandin.

Lijneyê 19 civîn û bi 134 şexsiyet û saziyan re hevdîtin kirin. Lijneyê 24ê mijdara 2025an çû girava Îmraliyê serdana birêz Ocalan kir û perspektîf û pêşniyarên Ocalan wergirtin. Mirov dikare di du helwestan vê serdanê rexne bike. Yek jê, pêkhateyên lijneyê bi temamî serdana Ocalan nekirin wek CHP û Yeniyol Partiyê, rexneya duyemîn jî rapora şandeya ku serdana Ocalan kir bi raya giştî re nehat parvekirin. Ev helwest bixwe jî nîşan dide ku sansûr û tecrîda li ser birêz Ocalan didome. Lê dîsa ev serdan tevî hemû kemasiyên xwe jî gavek girîng bû. Mirov dikare bibêje cara yekemîn e ku di çareserkirina mijara têkoşîna mafên bingehîn ên kurdan de bi şandeyek siyasî re hevdîtin hat kirin. Ji ber wê jî serdan û hevdîtina bi birêz Ocalan re girîng û dîrokî bû. Lijneyê piştî van xebatan, raporên partiyên ku xebatên lijneyê û yên ku ji serkeftina pêvajoya aştî û demokrasiyê pêşniyariyan dihewîne kom kirin. Niha jî ji bo raporek hevpar xebatên xwe didomîne. Lê ji bo xebatên hevpar divê baldar be. Ji ber ku raporên partiyan mixabin li gorî pêwîstiyên pêvajoyê nikarin bibin bersiv. Bi taybetî jî rapora MHPê û AKPê di bicihanîna mafên kurdan de gelek qels in. Hema mirov dikare bibêje rapor înkara tifaqa kurd û tirkan, înkara pêvajoya damezrandina Komara Tirkiyeyê û trawmaya kurdan a ku "li ku dera dinyayê kurd bibin xwedî mafekî ew ê Tirkiye êrîş dikên" zindî dike. Lê ji bo aştî, demokrasî û xwişk-biratiyê jî ti plansaziyek, bernameyek an jî pêşniyarek di nav xwe de nahewîne.

MHP di rûpela 72emîn a rapora xwe de dibêje; ''Eger pirsgirêk wekî pirsgirêkek sedsalî bê qebûlkirin; divê mijar bigihîje damezrandina komarê û bi vî awayî nirxên me yên damezrîner an jî pêvajoya avakirina dewleta neteweyî. Ji ber ku tiştekî wiha ne mimkun e; em van îdiayan; ne ji bo çareserkirina pirsgirêkê, lê wekî nîşana lêgerînek niyetxirab, xayin û defika têkoşîna siyasî ya ku dixwaze dewleta neteweyî û kodên damezrîner ên Komarê bixe nîqaşê û bingehên dewletê bihejîne, dibînin. Em nikarin li hember wan kesan re toleransê nîşan bidin ku bi nîqaşkirina beriya Peymana Lozanê û Destûra Bingehîn a 1924an hewl didin pêvajoyê sabote bikin."

Wisa xuya ye ku MHP li ser serkeftina pêvajoya aştî û demokrasiyê derî digire. Ji ber ku ev sedsal in çi pirsgirêk hene bi Peymana Lozanê û Destûra Bingehîn a 1924an ve dest pê kiriye. Peymana Lozanê welatê kurdan kiriye çar parçe, Destûra Bingehîn a 1924an jî hebûna kurdan înkar kiriye, Tirkiyeya pirçandî, pirzimanî, pirolî, pirnasnameyî ji holê rakir û hemû nasname, çand û zimanên bi helwesta "yekperestiyê" heland û bişaftin. Bi vê re pirsgirêk û têkoşîna sedsalî jî dest pê kir.

Gelo çi beriya Peymana Lozanê û Destûra Bingehîn a 1924an qewimî bû? Dîroknas pêvajoya beriya Peymana Lozanê û Destûra Bingehîn a 1924an wek pêvajoya damezrandina Komara Tirkiyeyê pênase dikin. Ev pêvajo di navbera 1918 û 1923an de ye. Ev pêvajo di tifaqa kurd û tirkan de cihêk girîng digire. Osmanî di Herba Yekemîn a Cîhanî de têk çû bû hemû pêkhate ji Osmaniyan vediqetiyan û dewletên neteweyî ava dikirin. Kurd jî ji aliyê dewletên emperyal ve li Rojhilata Navîn hatine tecrîdkirin. Di nav vê aloziyê de Mustafa Kemal derbasî Anatolyayê dibe. Lê li Anatolyayê ji xeynî kurdan ên ku piştgiriyê bidin Mustafa Kemal kesek tune ye. Mustafa Kemal û kurdan li Kongreya Erziromê di encamnameyê de, hat tesbîtkirin ku tirk û kurd "di bextewarî û felaketê de hevpar in" û "armancên wan ên ji bo paşerojê yek in". Hat gotin ku "ew bi rêzdarî li hember rewşa nijadî û rewşa civakî ya hevdu ne û birayên xwînê ne". Di heman daxuyaniyê de jî ji mafên kesên ku li herêmên ku kurd bi giranî lê dijîn têne axaftin, hat destnîşankirin ku "divê li hember mafên kurdan ên dîrokî, nijadî û olî rêz bê nîşandan". Li Kongreya Sêwazê di daxuyaniya encamê de ji bo kurdan îfadeya "bi rêzdarî li hember cudahiyên wan ên civakî û siyasî û qaîdeyên herêmî ne, birayên xwînê ne" hat bikaranîn. Di protokolên Amasyayê de sînorê welat di xala 1emîn a protokola duyemîn de "sînorê Dewleta Osmanî (bi Destûra Bingehîn a 1921ê ev têgih wê bibe Dewleta Tirkiyeyê) yê ku tê tasawirkirin û qebûlkirin, eraziya ku tirk û kurd lê dijîn dihewîne û bêîmkaniya veqetandina kurdan ji civaka Osmanî (bi Destûra Bingehîn a 1921ê, ev têgih jî wê bibe gelê Tirkiyeyê)" hat diyarkirin. Dîsa, 27ê hezîrana 1920î, di talîmatnameya ku Mustafa Kemal ji Fermandariya El-Cezîreyê Nîhat Paşa re şandiye de, ji bo kurdan muxtariyet tê pêşbînîkirin û talîmat dide ku "li herêma ku kurd bi cih bûne jî, hem ji bo siyaseta me ya navxweyî hem jî ya derve, pêwîst e ku rêveberiyeke herêmî bê avakirin", û Zagona Bingehîn a 1921ê ku ji 23 xalan pêk dihat û ji van 23 xalan 14 xal bi tenê li ser mafê xweseriyê sekinî bû. Dîsa di xutbeya Bursayê ya Mustafa Kemal û di daxuyaniya çapemeniyê ya Kocaeliyê de ji bo pirsgirêka kurdan digot ku "meseleya kurdan bi muxtariyetê an go bi xweseriyê bê çareserkirin" ji bo damezrandina komara nû li hev kirin û esasên tifaqa kurd û tirkan aşkere nîşan dide.

MHP di rapora xwe de van bûyer û belgeyên dîrokî înkar dike; pêvajoya damezrandina Komara Tirkiyeyê înkar dike, tifaqa kurd û tirkan înkar dike. Destpêka Komara Tirkiyeyê ji Peymana Lozanê û Zagona Bingehîn a 1924an qebûl dike ku ev bixwe destpêka avakirina yekperestiyê û înkara pirçandî, pirolî, pirnasnameyiya Tirkiyeyê ye. Ji ber wê jî hema em ji anha de bibêjin; çareserkirina mijara kurd û tirkan bi ruh û dilsoziya pêvajoya damezrandina Komara Tirkiyeyê ku ew jî beriya Peymana Lozanê û Zagona Bingehîn a 1924an bû. Lewra kurd li ser van soz û peymanan tifaqa kurd û tirkan ava kirin û bi Mustafa Kemal re tevgeriyan.

Eger ku MHP di vê pêvajoyê de mafên kurdan ên xwebirêvebirinê yên çand û zimanî nas neke, van mafan neke nav hiqûqê, ew ê bi kurdan re bi kîjan rêyê jiyana hevpar û welatek aram, demokratîk û hevpar damezirîne gelo? Eger ku dîsa bi rêya înkarê be, wê demê aştî û demokrasî dimîne bihareke din!

Divê Lijneya Piştgiriya Neteweyî, Xwişk-Biratî û demokrasiyê van kêmasiyan baş bibîne û li gorî pêwîstiya pêvajoya aştî û demokratîk raporek ku di naveroka xwe de rê û rêbazên hiqûqî, siyasî û demokratîk dihewîne amade bike.



Xweşkanî
Felemez Ulug

# Pêvajoya guherîn û avakirinê

Ji serê sala 2025an ber bi destpêka 2026an ve, di siyaseta kurdî de pêvajoya guherîn û avakirinê yek ji mijarên herî sereke bû. Sala 2025an bi taybetî piştî banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, gelek guherîn çêbûn û gavên girîng hatin avêtin. Di çarçoveya van gavan de, divê kurd di sala 2026an de ne tenê di qada siyasî, lê di hemû beşên civakî de xwe çawa birêxistin bikin?

Em saleke tije bi guherînên lezgîn, krîzên kûr û berxwedaneke civakî li pey xwe dihêlin. Sala 2025an ji bo gelê kurd û gelên Rojhilata Navîn ne tenê saleke salnameyê bû, di heman demê de qonaxeke girîng a ceribandinê bû. Dema em gava xwe diavêjin sala 2026an, barê li ser milê siyaseta demokratîk hîn girantir e, lê derfetên çareseriyê jî hîn zelaltir bûne.

**2025: di navbera krîz û hêviyê de**

Di sala 2025an de, li Tirkiye û bakurê Kurdistanê pirsgirêkên ji salên borî mabûn, gihîştin lûtkeyê. Siyaseta "ewlehîparêz" a dewleta tirk li her çar parçeyên Kurdistanê zextên xwe domandin. Lê belê, ev polîtîka ne ku tenê pirsgirêka kurdî çareser nekir, her wiha asêbûneke siyasî ya kûr jî bi xwe re anî.

Krîza aborî ya li Tirkiyeyê herî zêde bandora xwe li bajarên Kurdistanê kir; bêkarî, bihabûn û xizanî veguherîn pirsgirêkên civakî yên rojane. Li gel vê, polîtîkayên dewletê yên şer taybet li nav civakê rê li ber pirsgirêkên mezin vekir. Di encama vê siyaseta qirêj de, sala 2025an bi taybetî ji bo ciwan û jinan saleke zahmet bû. Zextên li ser ziman û çanda kurdî vê salê jî berdewam bûn, lê li hemberî vê yekê hişmendiyeke xurt a parastina nasnameyê derket pêş.

**2026 divê bibe sala çareseriya civakî**

Ji bo ku sala 2026an nebe dubareya salên borî, divê di çarçoveya siyaseta demokratîk de guherînên radîkal çêbibin. Banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo vê perspektîfa pêwîst datîne holê. Di vê mijarê de Tevgera Azadiya Kurdistanê gelek gavên girîng avêtin. Li vir ya girîng ew e ku divê li gorî pêdiviyên bangê gavên pêwîst ji aliyê dewletê ve werin avêtin.

Siyaseta demokratîk di vê pêvajoyê de divê ne tenê di nav çarçoveya parlamentoyê de bimîne. Pêwîst e bibe dengekî ku li kolanê, li kargehan û li nav malan bê bihîstin. Helwesta rast ew e ku tifaqên demokratîk bi gelên din ên Tirkiyeyê re (tirk, ereb, ermen, hwd.) bên xurtkirin da ku jiyana hevpar ne tenê dirûşm, bibe projeyek.

Komîsyona ku li meclisa Tirkiyeyê ji bo çareseriya pirsgirêka kurdî hatî avakirin, di sala 2026an de bi du rêyan re rû bi rû ye; an wê bibe komîsyoneke tenê li ser kaxezê ku demê dixwe, an jî wê bibe navendeke muzakereyên şefaf û rê li ber çareseriya demokratîk vebike.

Ji bo serkeftinê, divê ev komîsyon li hemû aliyên şer û aştiyê guhdar bike û ji bo destûreke bingehîn a nû ku nasnameya kurdî nas dike, gavan biavêje. Ji vî alî ve pêvajoya 2026an divê li ser bingeha hiqûqa wekheviyê were avakirin. Ji bo vê yekê êdî pêwîst e ku gavên berbiçav werin avêtin.

Pêşî divê dewleta tirk û gelên li Tirkiyeyê fam bikin ku banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a ji bo "Aştî û Civaka Demokratîk" ne tenê bangeke taktîkî ye, nexşeya rê ya stratejîk e. Ji bo ku ev bang veguhere pratîkê, divê li Kurdistan û Tirkiyeyê gavên pêwîst werin avêtin.

Di çarçoveya pêşveçûna pêvajoyê û gavên ku divê di sala 2026an de werin avêtin de jî pêwîstî bi gavên pêbawer heye. Bi taybetî ji bo ku diyalogek rasteqîn dest pê bike, divê kanalên ragihandinê yên bi Îmraliyê re bi temamî vebibin. Ji bo vê jî divê dewleta tirk pêşî Rêber Abdullah Ocalan weke muxatebekî nas bike û pênase bike.

Ya din jî di sala 2026an de divê kurd li her çar parçeyan li ser bingeheke hevpar a demokratîk li hev bikin da ku li hemberî guherînên Rojhilata Navîn bibin xwedî statu. Aştî ne tenê karê siyasetmedaran e; divê dayik, ciwan û rewşenbîr, yanî hemû beşên civakê di sala 2026an de bibin motora sereke ya pêvajoya aştiyê. Aştiyeke ku mafê gelan neparêze, tenê bêdengiya beriya bahozê ye. Aştiya rasteqîn bi demokrasiya herêmî û azadiya çandî pêkan e.

Sala 2026an ji bo gelê kurd saleke wisa ye ku wê tê de hebûn an tunebûn nebe mesele, lê çawa jiyîn wê bibe mijara sereke. Heke siyaseta demokratîk bi wêrekiyeke mezin banga Rêber Abdullah Ocalan a aştiyê wekî bingeheke civakî bibîne, wê demê sala 2026an dikare bibe destpêka serdemeke nû ya azadiyê. Di vê çarçoveyê de gava herî mezin a ku divê were avêtin, baweriya bi hêza gel û daxwaza aştiyeke birûmet e.

Gavên ku siyaseta kurdî di sala 2025an de avêtin nîşanî me didin ku ew dikarin di sala 2026an de mohra xwe ne tenê li siyasta Tirkiyeyê, li ya Rohilkata Navîn jî bidin. Di vê qonaxa girîng de ya divê were kirin ew e ku siyasetek hemû beşên civakê bigire nav xwe were bipêşxistin. Ger li ser vê perspektîfê siaysetа kurdî were birêvebirin, ez bawer dikim ku wê sala 2026an ji bo kurdan bibe sala azadî û aştiyê ku bikaribin xwebûna xwe biparêzin.

# Li Sûriyeyê çi dibe?

Zinar Ronî

Tirkiye bi dewletên Behra Spî re pirsgirêkan dijî. Ji berê ve Tirkiye û Yewnanistan ne li hev in. Kibrisa aliyê Rûm jî ji Tirkiyeyê aciz e. Îsraîl û Tirkiyeyê demek dirêj karên stratejîk bi hev re meşandin lê niha di gelek aliyan de li hev nakin



Berî çend rojan heyeteke dewleta tirk derbasî Şamê bû. Di nav vê heyetê de Wezîrê Karên Derve Hakan Fîdan, Musteşarê MÎTê Îbrtahîm Kalin û Wezîrê Parastinê Yaşar Guler hebûn. Heyetê bi serokê Hikûmeta Veguhêz Colanî, wezîrê karên derve û wezareta parastinê re hevdîtin kir. Her çiqas di daxuyaniyan de were gotin ku ew li ser rewşa giştî sekinîne jî, mijara sereke rewşa Bakur û Rojhilatê Suriyeyê û kurd bûn. H. Fîdan di daxuyaniya xwe de dîsa di ser HSDê re gef li kurdan xwarin. Îşareta destwerdana leşkerî kir. Demek dirêj e Fîdan bi zimanekî tûj gefan dixwe. Gelo sedema vê çi ye?

Fîdan di pêvajoya 2013-2015an de musteşarê MÎTê bû. Muxatabê pêvajoyê bû. Dewletê di 2014an de ji bo tesfiyekirina Tevgera Azadiyê ‘plana çokdanînê’ amade kir. Lewma di 2015an de pêvajo ji ber armanca dewletê xera bû. Li vir rola MÎTê sereke bû. Wê demê jî mijara sereke rewşa Rojava bû. Fîdan, ji bo zemîna mudaxaleyê çêbike digot ‘Ez ê sê çar kesan bişînim aliyê din çend mûşekan bidim avêtin, lê ya muhîm ew e ku îradeya şer hebe.’ Di serdema ku Fîdan musteşarê MÎTê bû de hem darbeya 15 tîrmehê pêk hat hem jî li hemberî gelê kurd şerekî berfireh dest pê kir. Efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî hatin dagirkirin û polîtîkaya ‘bêkurd’ meşandin. MÎTê li derveyî welat li hemberî rêveber-pêşengên kurd suîkast li dar xistin. Li aliyekî Suleyman Soylu li aliyê din Hakan Fîdan her cure amûrên şer bi kar anîn. Lê dawiya dawiyê nikaribûn tevgera azadiyê têk bibin. Dewlet mecbûr ma polîtîkaya xwe biguherîne. Polîtîkaya şer têk çû. Niha jî dixwaze bi stratejiya siyasî tasfiyeyê bixe meriyetê.

Helwesta Fîdan a li dijî vê pêvajoyê gelek e. Bêguman ew bi tena serê xwe nikare rewşê diyar bike lê bandor dike. Di destpêka pêvajoyê de Sirri Sureya Onder behsa diyalogeke xwe û Fîdan dikir û digot: “Min ji Fîdan pirs kir ku ka pêvajoyê çawa dibîne û ew li kîjan alî cih digire. Lê bi acizî li min zîvirî û got, ‘Wî zilamî li nav çavê me nihêrî û li kêleka me arteşeke 100 hezar kesî da avakirin’.” Bi kurt û kurmancî Fîdan di pêvajoya 2013-2015an de bi ser neket. Niha êşa wê dikişîne. Lewma ji xwe re kiriye armanc ku Tevgera Azadiyê têk bibe.

Dîrok pir behsa Nîzamil Mulk dike. Wezîrê sereke yê Selçûkiyan bû. Bi avakirina teşkîlata îstîxbarî navdar e. Li gorî rîwayetan keyayê Selçûkiyan Melîkşah di avakirina tora îstîxbaratê de wî hişyar dike, lê ew guhdar nake. Dawiyê bi destê wê torê Nîzamil Mulk tê kuştin. Yek ji fedaiyên Hasan Sabah dikeve nav vê teşkîlatê û wî dikuje.

Fîdan li gorî xwe tevneke nû ya îstîxbarî ava kir. Ji ber ku hosteyiya wî li ser îstîxbaratê ye, ew difikire ku bi vî awayî dikare dewletê xurt bike. Dibe ku dewlet xurt bibe lê ev nayê wateya ku her pirsgirêk çareser bibe. Fîdan ji ber ku nikarî Tevgera Azadiyê bi stratejiya xwe tasfiye bike niha zêdetir êrîşkar nêz dibe. Tehamula îstîxbaratê ji demokrasiyê re tune. Fîdan jî ne bi demokrasiyê bi çewisandinên siyasî dixwaze bi hikûmeta Suriyeyê gav bide avêtin.

Dem heyeta tirk çû Şamê hevdîtin kir, di heman kêliyan de çeteyên HTŞê êrişî taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê kirin. Êrişên wan hatin şikandin. Tirkiyeyê xwest hakimiyeta xwe ya li ser çeteyan nîşan bide. Mixabin şikestina çeteyan jî peyamek grîng bû. Bawer dikim ku Tirkiyeyê jî fêhm kir ku bi van çeteyan nikare encamekê werbigire. Li aliyê din Suriye beyî ku zêde gengeşî derbikeve bi hêsanî girên Golanê radestî Îsraîlê kirin. Trump jî ev erê kir. Niha di nexşeya Suriyeya nû de ne Hatay heye ne jî girên Golanê. Tirkiye li beranberî Hatay girên Golanê dan Îsraîlê. Heyeta Tirkiyeyê têra xwe xurt çû Şamê. Xwest bêje ‘patronê Colanî ez im’. Lê dema axaftina Fîdan di nîvî de hate birîn, îxtîmaleke mezin heyeta tirk fêhm kiriye ku ka patronê Şamê kî ye.

Di modela nû ya pergala hegemonîk de rola hegemonyaya herêmî dane Îsraîlê. Lewma naxwazin dewleteke bi dikaribe ji Îsraîlê re astengî çêbike hebe. Bi awayekî şaxên Îranê qut kirin, bi peymanên Îbrahîmî berteka ereban jî xisitn bin kontrolê, niha dor li Tirkiyê teng bûye. Tirkiye jî li cihê ku alternatîfeke baş bi pêş bixe, bi qodên xwe yê damezrandinê tevdigere. Ev jî dest û lingên Tirkiyeyê girê dide.

Li Suriyeyê bi tirsa ku kurd bi Îsraîlê re tevbigerin stratejiyeke dijberiyê tê meşandin. Lê xeletiya wan jî ev e. Rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan dibêje ‘heke dixwazin Îsraîlê ji dewrê derbixin, bila stratejîk nêzî kurdan bibin bes e’. Hem kurdan sûcdar dikin hem jî hebûn û mafên kurdan naxwazin. Heta di axaftinekê de ji ber polîtîkayên xelet ên Tirkiyê ji heyata dewletê re dibêje “Ez li we dinihêrim lê li pêşt perdê Îsraîlê dibînim’’. Tirkiye ji ber ku bi heqaniyet tevnagere, li gorî mezhep, ol, etnîsîte cudakariyan dike, destê Îsraîlê xurt dike.


Suriye yek ji dewletên Rojhilata Navîn e ku sînorên wê bi Behra Spî re heye. Behra Spî di bazirganî û veguhestina enerjiyê de cihek pir grîng digire. Suriye demek dirêj li gorî siyaseta rûsan tevgeriya. Beşar Esad piştî ji desthilatê ket berê xwe da Rusyayê û niha li wir dijî. NATO, Amerîka û Îsraîl ji bo carek din Suriye nekeve bin hakimiyeta hêzeke derveyî wan polîtîkayeke taybet dimeşînin. Ji bo van hêzan a muhîm têkiliya enerjî û bazirganiyê ye. Demokrasî ne xema wan e. Çawa Efxanistan radestî Talîban kirin wisa Suriye radestî HTŞê kirin. Ji bo wan a grîng ew e ku desthilat ji wan re pirsgirêkan dernexe. Hewl didin bandora dewletên derveyî xwestekên wan tevdigerin bişikînîn. Ji ber vê jî bi Tirkiyeyê re hinek gengeşiyan dijîn.

Tirkiye bi dewletên Behra Spî re pirsgirêkan dijî. Ji berê ve Tirkiye û Yewnanistan ne li hev in. Kibrisa aliyê Rûm jî ji Tirkiyeyê aciz e. Îsraîl û Tirkiyeyê demek dirêj karên stratejîk bi hev re meşandin lê niha di gelek aliyan de li hev nakin. Ji ber helwesta Birayên Misilman Tirkiye û Misir jî zêde ne li hev in. Di dest Tirkiyê de dewletên biçûk ên wekî Lîbya, Cezayîr, Fas û Suriye dimînin. Polîtîkaya Cezayîr û Fasê jî hinek serbixwe ye, li gorî zagonên giştî yên bazirganiyê tevdigerin. Tenê du dewlet dimînin: Suriye û Lîbya. Ev her du dewlet jî niha di nav xwe de aloziyan dijîn. Tirkiye hewl dide bi ser wan re hakimiyeta xwe ya li ser Behra Spî xurt bike. Mixabin ev her du dewlet ne ewqas xurt in ku bi serê xwe tevbigerin. Lîbya jî di gelek aliyan de polîtîkaya Tirkiyeyê napejirîne. Tirkiyeya ku serokê Lîbyayê, general Hafter, wekî çete bi nav dikir, niha dixwaze pê re tifaqê bike. Xistina balafira fermandarê giştî yê Lîbyayê jî hişyariyek bû ji bo Tirkiyeyê.

Li Suriyeyê ji bo çareseriyeke mayinde wisa dixuyê ku dê gelek av biherike. Kurd heya pergaleke xweparastinê ya mayinde ava nekin nikarin parastina xwe bispêrin hêzên din. Pêşeroja Suriyeyê ne diyar e, di vê rewşê de li derveyî aqilan e ku bêjin bila kurd bi awayekî ferdî tev li dewletê bibin. Desthilateke ku di her derfetê de êrişî kurdan dike nikare kurdan qanih bike ku bi komkujiyê re rûbirû namînin. Lewma berî çareseriya leşkerî hewcedarî bi çareseriya makezagonê heye, berî ku mijara çekan were nîqaşkirin divê şert û mercên aştiyê werin misogerkirin.

Bi kurtasî li Suriyeyê şerê desthilatdariyê tê meşandin. Ji aliyekî ve Îsraîl ji bo hêzeke li hemberî wê nikaribe derkeve, dixwaze desthilatê li gorî xwe dîzayn bike. Tirkiye ji bo li Rojhilata Navîn bibe xwedî gotin hewl dide li ser Colanî bandorê bike û çareseriyeke li gorî xwe ferz bike. Amerîka rola hakemtiyê girtiye ser xwe, lê zêdetir aliyê Îsraîl digire, ji ber ku heya niha ew jê re zêdetir bi fêde xuya dike. Îran di ser elewiyan re dîsa dixwaze li wir qadeke siyasetê ji xwe re veke. Dewletên ereb ji bo Colanî dernekeve derveyî gotina wan çeka sermayeyê bi kar tînin. Di rewşeke wisa de kurd dixwazin hem mafên xwe bixin bin garantiyê hem jî bi gel û baweriyên din re pergeleke demokratîk a komunal ava bikin. Çareseriya li Suriyeyê dê ji tevahiya Rojhilata Navîn re jî bibe modelek.

# Divê kurd aştiya kurewî ava bikin



Medenî Ferho

Li Tirkiyeyê siyaseta komployan veguheriye siyaseta şantajan. Her cure sosyolojiyê îflas kiriye. Bi gotineke din “kîtab-i umûmiye” petixiye! Sosyolojiya civakî, sosyolojiya siyasî, sosyolojiya bajarvanî, sosyolojiya îktîsadî û sosyolojiya zanistî îflas kiriye

**Siyaseta “tîpîsî” bi pêş ketiye.**

Gotina “tîpîsî”, car yekemîn ji aliyê zanyarê siyasî yê awusturalyayî John Kean ve hatiye bikaranîn. Ya rastî, John Kean ev gotin ji bo “medyaya bazirgan” bi kar aniye. Lê gotina “tîpîsî” hem li bejna siyaseta Tirkiyeyê tê, hem li bejna medyaya tirk tê. Ev jî tê wateya, her cure “sansasyonalîzm” heye; xavîtî, kelêtî, kirêtî û bêexlaqî zêde ye!

Tirkiye bi nav misilman e, lê her cure bêaxlaqî heye. Di misilmantiyê de her cure bêealqî sucê dojehî ye. Mixabin, li Tirkiyeyê ‘‘dar-ûl erd’’ heye, ev jî tê wateya her kiryar û her tişt mubah e. Vê jî “fiqih” têk birine, û “nirxên exlakî” tune kirine. Li şûna van nirxan “îdeolojiya populîst” û “dagirkeriya dewşirme” empoze dikin. Ev jî faşîzma kevir e!

“Dagirkeriya dewşirme” duh, qirkirina gelan dikir pratîkê; îro, yanî piştî sed û deh salan, bi dilê nerm û sefaleta ziman dagirkeriyê dike. Ev jî zor e. Ji ber ku kurd, piştî têkoşîna nîvsedsalî, bi ‘‘wazên“ wan naxapin û sefaleta humanîstiyê jî baş naskirine. Balkêş e, li Enqereyê guhên dîwaran hene û bûye sedema ku şikestikên navbera desthilatdarên Îttîhat û Terakkiyê zêde bibin û li dij hev şer bikin.

Balkêşiya din jî ew ku, her du alî jî di şerê li dijî kurdan de li yek pîpikê dixin.

Aliyek hêdîka li pîpikê dixe, aliyê din bi şid lê dixe.

Em hinekî din vebikin; berxwedana nivsedsalî dagirkeriya klasîk têk bir. Sîstema Îttîhat û Terakkî, yanî sîstema înkar û tunekirinê berteref kir. Wek me li jor rêz kir, her cure sosyolojî petixî. Nema dikarin sefaletek nû li ser kurdan ferz bikin. Kurdan ev rê li ber wan girtiye û nikarin bi reçeteyên derewîn kurdan bixapînin.

Êdî kurd, ji bo bîrînên xwe yên civakî, ew bixwe reçeteyên xwe dinivîsin. Gelek rewşenbîr û nivîskarên kurd jî bi guman nêzîkî pêvejioya çarserî û civaka demokratîk dibin. Ev helwestek lawaz e û nefêhmkirina rewşa îro ya cîhanê ye.

Divê were zanîn ku gelê kurd, gihaye asta ku bi hişmendiyek kolektîf tevbigere, vegotinên “îrrasyonal” red bike û “bûyerên trajîkomîk” qebûl neke… Di jiyana rojane de jî, li kolanan gel, li mizgeftan û li meclisa Enqereyê jî li dijî despotîzmê, bi dirûşm û hişmendiya “azadiya hukumranî û ekonomîk” têdikoşin. Ev jî tê wateya têkbirina hêza dîroka mekanîk û jinûveavakirina sosyolojiya civakî û vegera li dîroka gelan a nû. Ji ber vê çendê, dewleta Enqereyê mecbûr bû, bang dexaleta hawarî li Rêber Abdullah Ocalan bike.

Abdullah Ocalan, bi înîsiyatîfek dîrokî rabû, banga “aştî û civaka demokartîk” kir. Ev bang tê wateya vegera hişmendiya Sokrates û gihîştina felsefeya serdama civakî û jinûveavakirina sosyolojiya ku dikare pirsgirêkên gelan çareser bike.

Di heman demê de, tê wateya ku sergo-qirêjiya mîratzedeyên Îttîhat û Terakkiyê ya sed û deh salan paqij dibe. Dema ku Rêber Apo, behsa biratiya gelê kurd û tirk jî dike, dixwaze, mêjiyê ku bi normên dîroka çekirî û nijadperestiya “înkarê” tevlihev bûye paqij û zelal bike. Dixwaze tirs û derewên bi bangên “kakafonî” ku gelan dixapînin, bi gef û şantajan ditirsînin, ji holê rabike. Apo, vekirî, ji roja destpêkê û heta îro dibêje; şer, kuştin, dagirkerî, yekperestî, nijadperestî û înkar ne kilîda bihuştê, lê vekirina dergehên dojehê ye.

Apo, destnîşan dike ku têkbirin û tunekirina gelê kurd, gelên din nebûye azadiya gelê tirk, bûye bihuşta tekelîstana serdest û bazirganiya kapîtalîstan…

Krîz û sefaleta li Tirkiyeyê jî mînaka vê rastiyê ye. Di vê pêvejoyê de, xespkarên bi haydûdiya Îtîhat û Terakkiyê hereket dikin, rabûne ser piyan, bi hêrs û kompleksa “Neron” dest bi dijberiyê kirine. Bangên ji bo despêkirina “terora dewletê” dikin. Bi gotina Jean Paul Sartre, “ev îdeolojiya kevir e; hem dikuje, hem ji bo koletiyê zêdebûnê dixwaze.”

Mîratzedeyê Îttîhat û Terakkî, bi taybetî, di kesayeta serokê ÎYÎ Partiyê Musavat Derwîşoglu û serokê Zafer Partîsî Umît Ozdag de derdikevine pêş. Parlamenterê ku ji ÎYÎ Partiyê îstifa kir û tev li CHPê bû, yanî Umît Dîkbayir jî, bi îdeolojiya “faşîzma kevir” hemû parlamenterên DEM Partiyê terorîst îlan kirin.

Ev exlakê “konformîzm”ê ye, bi gotina J. P Sartre, ‘‘provakatoriya bi zora geometrîk’’ e. Umît Dîkbayir jî, bi vê rol û misyonê hatiye erkdarkirin. Bi şêwra faşîstên dagirker, ji ÎYÎ Partiyê îstifa kir û tev li CHPê bû. Çawa tev li CHPê bû, tevahiya parlamenterên DEM Partiyê weke terorîst bi nav kirin. Ev sûc e û diviyabû, dozgeriya komarê, ji bo parastina wî were rakirin felzekeyekê amade bikira û ji serokatiya meclisê re bişanda. Divê ev çepel-kotî li dadgehê hesab bide. Mixabin heta îro gavek nehatiya avêtin, xuya ye ku nayê avêtin jî.

**Ev siyaseta “tîpîsî” ye!**

Bi xetên stûr û reş dibêjim; armanc ew e ku CHPê, ji xeta çareseriya pirsgirêka kurdî dûr bikin û tev li xeta ÎYÎ Partî û Zafer Partisiyê bikin. Parlamenterê DEM Partiyê Alî Bozan jî, ew bi gotina “kotî” bi nav kir.

Kotî, tê wateya “çepeli”yê, yanî qudûs. Dema ku “çepelekî” êrişî parlamenterên DEM Partiyê kir; Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê, Hakan Fîdan, Wezîrê Parastinê Yaşar Guler û serokê MÎTa tirk Îbrahim Kalin çûn Şamê. Medyaya tirk ya “tîpîsî” ev serdan weke “fotmata 3+3’’ bi nav kirin.

Amanca fotmata 3+3 ew bû ku bi navê entegrasyonê, kurdan bêçek bikin. Yanî bi kevirekî di çûkan bikujin; yek, ev ekîb li dijî çareseriya “aştî û civaka demokratîk” e û dirûşma ‘‘bêçekkirina rêxistina terorê PKK û sedsala komara Tirkiyeyê” xurt dike. Li Rojava jî dixwazin hêza kurdan, sîstema “kûrewî” ku derketiye holê tune bikin.

Di dema wê serdanê de, komên paramîlîter ên Şamê jî, bi tank û topan êrişî taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê kirin. Ev êriş gefxwarina faşîzma Evqereyê bû!...

Tirkiyeya ku ola îslamê dike maske, li Lîbya, Misir, Iraq û Suriyeyê gelên misilman kuştin; îro jî car din li Suriyeyê misilmanan dikuje… Mixabin rojnamevan, nivîskar û rewşenbîrên Tirkiyeyê jî, vê helwesta bi hişmendiya “oryantalîst” nêzîk dibin, bi “hestên kor”, “birîn û kûnêra xebîs” hereket dikin. Tenê kêmasiya “rîtûelên cuda” û “heciyên dewlemend” derdixin pêş.

Heta îro, yek nivîskarê ku xwe weke aqilê misilmanan nîşan dide, li dijî êrişên romê û çeteyên paramîlîter ên li dijî gor û goristanên kurdan, reaksiyon nîşan nedaye. Lê ew baş dizanin ku cenabê Muhammed, li pêşberî cenaze û goristanên cihûwan bi rêz hereket dikir.

Şer, tenê bi çekan çênabe; şerê gotinê jî heye… Agirbest û avakirina civaka demokratîk jî şer e! Divê em dewleta Enqereyê ya xespkar û înkarê mecbûr bikin, hem siyaseta “tîpîsî” û faşîzma kevir berteref bikin, hem siyasetmedarên kotî-çepel mehkûm bikin û aştiyeke kûrewî ava bikin.

# Kurd ne kurdên berê ne

Vî gelê xweragir û niştimanhez, mafê aştî û azadiyê ji mêj ve standiye û êdî ti kes û ti dewlet nikare ji dest bigire. Gelê Kurdistanê ji berê gelek xurtir, zanatir, hostatir, dîplomatir e û bûye xwedî viyanek ji pola



Ahmet Aktaş



Em ji sala 2025an, derbasî sala 2026a bûn. Ka em bi kurtayî bala xwe bidin hinek bûyerên girîng ên sala 2025an. Di asta giştî de, dewama şerê Ukrayna û Rûsyayê, dîsa di mijara sereke ya rojeva cîhanê de bû û hema li kêlaka wê şerê Xeza û Îsraîlê jî bi heman dengvedanê dewam kir.

Her çendîn Trump dibêje 'min dawî li van şeran anî' jî, lê ne weke ku ew dide diyar kirin e. Ji ber ku birînên van şeran di jiyana gelên wan welatan de kûr in û bi giştî bandora xwe ya neyînî li ser mirovahiya cîhanê jî hiştiye, wê hîn pir dewam bike; dermankirina wan birînên giran, ne ew çend hêsan e.

Ne di asta van şeran de be jî, lê weke dewama wan an jî paralelî wan şeran, li gelek welatan, curbicur şer pêk hatin û hîn jî bi zêdebûn û firehbûn dewam dikin. Weke mînak êrişên Îsrail û Îranê yên li dijî hev, gefên Trump ên li Venezûella, Meksîka, Kanada, Danimarkayê û hwd. Ev gef carcaran derbasî asta şer jî dibin.

Dewleta tirk û Îsraîl, li gelek cihan hatine dijberî hev; weke mînak li Behra Spî li derdorê Qibrisê, di van rojên dawî de navbera wan hîn nexweştir bûye, ji ber ku Îsraîl-Yewnanistan-Qibrisê hevpeymanek berfireh a sêalî çêkirine. Herwiha bi heman armancê niha Îsraîl û Tirkiye li Somaliyê jî hatin hemberî hev, ji ber ku Îsraîl, dewleta yekê ye ku hema bi lez Somaliland weke dewlet pejirand, 30ê kanûna 2025an!

Bêguman li van welatên ku şer û pevçûn rojbiroj zêde dibin, parçeyên ji şerê cîhanê yê 3yemîn in û ev şer, bi giranî di navbera siyaseta DYA û Çînê de dimeşin. Helbet divê Rûsya neyê jibîrkirin, lê li gorî Çîn û DYAyê niha dikeve rêza duduyan.

Êdî ev dewletên hegemon, her yek li gorî berjewendiyên xwe û li gorî hêz û rola dewlet û aliyan, ji xwe re hevalbendan çêdikin. Helbet mîna gotina pêşiyên kurdan 'lêv berî diranan e', wê wextê divê em jî pêşî ji bo berjewendiyên gelê xwe û welatê xwe mêjiyê xwe bixebitînin û wisa jî hewl bidin!

Li welatê me, mijara sereke ya vê sala derbasbûyî ya 2025an, despêkirina Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bû û wê di sala 2026an de jî ev mijar, bi hemû giranî û girîngiya xwe di mijara sereke ya rojevê de be. Herwiha tê zanîn ku ev pêvajo, ji aliyê Rêber Apo ve, 27ê sibatê, hat despêkirin û niha jî her bi pêşengiya wî tê birêvebirin.

Li ser daxwaza Rêber Apo, meclisa Tirkiyeyê komîsyonek ji bo çareseriyê ava kir û şandeyek ji vê komisyonê çû Îmraliyê li gel wî rûnişt û guftûgo dan despêkirin. Pejirandina vê pêvajoyê û çûna Îmraliyê ya şandeya komisyonê, hat wateya ku êdî dewlet, bi fermî hebûna Kurdistanê, doza gelê Kurdistanê û weke hinkûf (muxeteb) Rêber Apo nas dike. Ev qonaxek nû ye, gelek girîng e û herwiha serkeftinek birûmet a doza gelê Kurdistanê ye. Helbet, bi hêsanî ev destkeftin pêk nehat. Ev di encama xebat, lebat, ked, xwêdan û xwîna pîroz a 52 salan de pêk hat û îro em gihîştin vê qonaxa aştiyê û ber bi civaka demokratîk û azad ve diçin.

Weke Rêber Apo dibêje, 'em ji ser dika sêdarê (îdam) hatin ser dika danûstandinê (muzakereyê-bazarê)'! Ev qonaxek, ji her alî ve girîng û dîrokî ye. Helbet ji îro û pê ve jî wê xebat ji ya berê ne kêmtir be, berevajî, êrê wê bi rengekî din, bi navekî din, bi stratejî û şêwazên nû be, ji xebat û rêxistina hîn mezintir û berfirehtir lazim e ji bo serkeftina vê pêvajoya nû.

Hin xêrnexwaz, yên li dijî pêvajoyê, kedxwar, talanker, xwînxwar û desthilatdar hene, wê hewl bidin dîsa mîna berê provakasyon, lîstok, fen û hîlebaziyan bikin, da ku bikaribin pêvajoyê pûç bikin û desthilatiyên xwe weke berê bidomînin.

Lewma, divê hêvî ji ti desthilatdaran neyê kirin, ew bi dildarî nayên lihevhatina pêvajoyê, ji naçarî tên, loma divê em bi bingehîn baweriya xwe bi hêza xwe ya cewherî bînin; em pişta xwe bispêrin hêza xwe û ya gelê xwe, erê em baweriya bixwe bînin lê em alikariya dostên xwe yên dildar ên navneteweyî jî ji bîr nekin.

Rêveberiya gelê Kurdistanê ji berê gelek xurtir, zanatir, hostatir, dîplomatir e û bûye xwedî viyanek ji pola ku êdî ti kes û ti hêz nikare vê vîn û hêzê bişikîne.

Êdî weke gotinên ku dibêje 'cin ji şûşê derket, kes nikare vegerîne dîsa bixe şûşê'; hema em bişibînin dîroka gelê xwe û bêjin 'gelê me ji bin wê xaka ku dewletê ser çîmento kiribû ya bin çiyayê Agiriyê derket, êdî ti kes û ti dewlet nikare serê vî gelê birûmet bitewîne û îradeya wî ya ji pola bişikîne!'

Vî gelê xweragir û niştimanhez, mafê aştî û azadiyê ji mêj ve standiye û êdî ti kes û ti dewlet nikare ji dest bigire û jê bistîne, weselam...!

Hêvîdar im û bawer dikim ku sala 2026 û salên li pey wê, bibin salên azadiyê, aramiyê û bihevrejiyana wekhev a civaka demokratîk! Sala 2026an, li Rêberê me, gelê me û mirovahiyê pîroz be!

Daxistan Payçû

# Şopeke li ser şîn û veşartina goriyan

Kurdistan yek ji welatên herî dewlemend ên dinyayê ye. Ev bi dewlemendiya çand, bawerî, têkiliyên aborî (bi çand û baweriyê ve têkildar) û hwd ve têkildar e. Yek ji awayên herî kevnar ên veşartina goriyan, dayîna goriyan a ji bo ajalan e. Qizqapanên zerdeştiyê û beriya wê mînakên wê kevneşopiyê ne. Hîna jî ji aliyê nav ve wekî domdariya vê li gelek deverên Kurdistanê gund û warên bi vî navî hene. Ev ji kevneşopiya toteman maye. Çawa ku di sersalan de ajalên totemî nêçîr kirine, wekî lêvegera xwezayî jî gava ku yek miriye cendekê wî/ê piştî bicihanînên dînî birine danîne ser qizqapanan û dane ajalên totemî. Li Kurdistanê ajalên wekî baz, şêr, mar, gur û hwd ji van ajalên totemî ne ku gorî (mirî) dane wan. Bes ev bi tenê ajalên goştxwir in. Gelek ajalên totemî yên çêrexwir jî hene. Qizqapan cihên bilind in. Piranî kevirekî di bejna mirov de li ser cihê bilind tê rastkirin û cendek li ser tê danîn. Hîna jî ji van keviran (mînakên destpêkê yên tenaşo û çardarê) li gelek gund û warên kevnar ên li Kurdistanê li cihên bilind mane.

Yek ji awayê veşartinê şewata di nav agir de ye. Ev kevneşopeke baweriya agir e ku hîna li gelek welatan pêk tê. Gorî di agir de tê şewitandin. Li gorî vê baweriyê mirov ji agir hatiye û divê cardin vegere agir. Beriya zayînê şopên vê kevneşopiyê li Kurdistanê gelek in. Hîna jî li nav kurdan wekî domdariya vê kevneşopiyê, li gelek deran heta sê rojan li ser gorê agir tê dadan. Veşartina gorî ya berdana nav avê li gelek derên dinyayê jî navdar e. Lê şopên ku berê kurdan jî di çeman de goriyên xwe berdane dixuyên. Bi taybet mîtolojiya hespê avê û baweriya anahît ku xwedawenda avê bû û heta hatina îslamê jî xwedî cihekî xurt bû, di vê hêlî de mînak in. Wekî domdariya mayîna di binhişê civakî de li Kurdistanê hin kuştin û xwekujî bi avêtin û xweavêtina avê (çem) pêk tên.

Di qirkirina Dêrsimê û hinekên din de ji bo nekevin destê neyaran xwe biroda berdana bi taybet jinên kurd dibe ku bi vê kevneşopiyê ve jî têkildar be. Dîsa wekî domdariya baweriya dara pîroz, miriyan li Kurdistanê di kokên (ray) daran de jî veşartine. Heta salên 1990î jî bi taybetî zarokên biçûk di rayên daran de vedişartin. Lê ev yek ji kevneşopên herî berfireh ên kurdan e. Berê li ber her gorekê darek diçikandin. Her mirov xwedî darekê bû. Dar, giyan û heqîqet bû. Lê li hinek herêman goristanê li dora dara pîroz ava dikirin. Ew dar, heqîqet û jinûvevejîna goriyan bû.

Li nav kurdan du awayên kêlikan heye ku yek kevir e yek jî dar e. Baweriya dara pîroz kevneşopeke xwedawendî ye. Veşartina miriyan di keviran de yek ji awayên herî navdar ên veşartinê ye li Kurdistanê. Çand û baweriya kevir li Kurdistanê gelek dêrîn e. Ji Xerabreşka Rihayê bigire heta şikeftên îroyîn ev didome. Kêlikên ji kevir yek ji mînakên vê baweriyê ne. Kevir wekî hestiyên dinyayê hatiye pejirandin. Lewma qewînbûn bi kevir pêkan hatiye dîtin. Ji bo vê jî mirî di keviran de hatine veşartin.


Îro olên yekxwedayî bi awayekî baweriyên axê û dara pîroz in jî. Lewma mirî îro wekî gelemperiya dinyayê li Kurdistanê jî bi gelemperî di axê de tên veşartin. Ji ber ku kevneşopa dara pîroz e jî, ji bo kurdan pir cudahî çênebûye. Ba, di baweriyên giyanewer ên Kurdistanê de jî hatiye hebandin. Piranî miriyên ku tên şewitandin didin bayê. Di zervaniyê de (ba û dem) hin şopên wê bixuyên jî bes dîtbariyeke şênber a ku gihîştiye dema me nîne ku pêşkurd an jî kurdan miriyên xwe dane bayê. Lê di wêjeya devkî ya kurdî de şopên wê hene. Veşartina goriyan a di xîmê malan de jî li Kurdistanê navdar e. Ev ji kevneşopiya perestgehan tê. Zarokên ku tên dinyayê û dişibin mezinên xwe, wekî giyana van miriyan hatine hesibandin. Mirî di malê de tên çalkirin û zarok dîsa li heman malê tên dinyayê. Ev, domdariyeke baweriya kirasguhertinê ye jî. Sedemeke girîng a ku navê pîrik û kalikan li zarokan tê kirin jî bi vê kevneşopî ve têkildar e. Veşartina li serê çiyayan jî li Kurdistanê navdar e. Çiya li nav kurdan mijara bawerkirinê ye jî. Lê di heyama navîn de piranî mirovên zana li çiyê hatine veşartin. Lê veşartina li çiyayan a miriyan têkiliya xwe divê ku bi baweriyên asîman re jî hebe. Wekî şev û stêrkên ku dest nagihîjinê, mirovên ku li çiyayan tên veşartin jî wekî ku bixwe ji ber çavan wenda bûne hatine nirxandin.



Kurdistana ku dergûşa mirovahiyê ye, bi çand û baweriyên xwe yên rengîn şahidî li dîroka mirovahiyê hemûyî dike. Bi tenê van awayên ku di vê nivîsê de hatin ziman bi serê xwe nêrîn û felsefeyeke kûr a mirovahiyê di nav xwe de dihewîne. Fêhmkirina vana, wateya jiyanê û bandora girîngiya çanda heyberî ya li ser baweriyan jî radixe ber çavan ku îro jî bi hişê civakê û derûniya mirovan vedinêrîne.

# Komelo demokratîk de cuye

Komelo demokratîk de cuya zafziwanî komelkîya ke derûdorê cinîye de yena şekilgirewtene, ekolojîk, komunkî, pluralîst û erjanê demokratîkan esas gêna. Bêrê ma pîya 2026î bikerî serra aştî



Cemîle Turhalli



Nika ma hewteyê serra 2026î de yî. Semedê ma serra verêne serrêka tarîxî bîy. Çunke prosesêko newe dest pêkerd. Nameyê nê prosesî bi vatişê birêz Ocalanî 'komelo demokratîk' ame vatene.

**'Komelo demokratîk' yeno çi mana?**

Cewabê nê heme persan no nuşte de helbet ma nêeşkenî bidî labelê cewabê nê persan cuye û xeyalanê şima de yî. Nê persan ma eşkenî zêde zî bikerî. Mesela komel do semedê çi demokratîk bibo. Wexto ke demokratîk bi, çi keweno destê merdim û şaran. Wexto ke komel demokratîk nêbi merdim çi vîndî keno.

Emrê merdimî goreyê şeklê xo yê nikayinî qasê 250 hezarî est o. No emir goreyê, emrê dinya sey zereyê mîlyaranê murayan de qasê murayêk a. Na mura hende xususîyetê ci est a ke eşkena murayanê bînan bihelêna. Senî bena ke yew mura, bieşka murayanê bînan bihelêna. Cewabê ney tarîxê merdimî de nimite yo.

Merdim xususîyetê xo yê verênî ma eşkenî vacî ke bêguman komelkîye û adaptasyono lezkanî yo. Merdimî hertim xo ganîyanê bînan ra pawit û înan reyde têkilî rona. Goreyê çimanê ey ganî her çî pê hetêyewbînankerdiş bêro kerdene. Seba aye cuya ey de çend hezar serran de ziwan, kultur, hiş virazîyayo. Ma eşkenî vacî ke nê heme xususîyetan merdim kerde estîya komelkîye.

E stbîyayîşê merdiman de hertim xoaverberdiş est o. Cuya merdiman de hem xoaverberdişo bîyolojîk hem zî kulturî est o. Kultur de ziwan, werd, bawerî, folklor, edebîyat, est o. Nê heme zî semedê cuye şert î. Bê înan zî merdim xususîyetê xo şinasnayo, sosyolojîyê xo goreyê înan qebul kerdo. Ge ziwanê xo reyde komelê xo pênas kerdo, ge bawerîya xo, ge zî erdê xo ge-ge zî netewa xo reyde, xo pênas kerdo. Înan semedê xo nasnameyêko komelkî qebul kerdo. Heta ke destê ey ra ameyo erdê xo ra cêra nêbîyo. Heta ke destê ey ra ameyo ziwanê xo ra bawerîya xo ra fek veranêdayo. Timûtim waşt ke nê nasnameyanê xo biresno neslo newe û neslê neweyî reyde aver şîro. Mergê xo yo fîzîkî zî newaşto, mergê xo yo sosyolojîk zî newaşto. Ge şer kerdo, ge hukm kerdo ge-ge zî bi şeklêko newe, xo pênas kerdo ke wa semedê şaranê bînan bi hewayêko tehluke nêro qebulkerdene.

Mesela netewa farsî bawerîya înan verê cû zerdeştîye bîy. Wexto ke înan îslam qebul kerd waşt ke kulturê xo yo verên zî bipawî, zereyê etnîsîteyanê bînan de nêhelîyî. Semedê aye xo ra vatî ma musluman î, labelê mezhebê ma şîî yo. Wina kerdî ke xo netewa ereban ra cîya bikerî cuya xo û kulturê xo bipawî. Kurdê elewîyî cuya xo û kulturê xo yo verên waşt ke bipawî xora vatî; ma elewî yî ma rayîrê heqî ra şonî. Ma eşkenî vacî ke semedê komel û pêro şaran no sey xopawitişî bi.

Nika ma reyna bêrî babeta xo ya komelê demokratîkî. Ma eşkenî vacî ke sîstemê komelê demokratîkî semedê şaran xopawitiş o. Komelo demokratîk tewr zaf hîrê xususîyetan ser o xo mojneno. Ekolojî, cinî û komun.

**Komelo demokratîk de ekolojî**

Perspektîfê ekolojî de heme ganîyî seypê hesibîyenî, mabenê ganîyan de hîyerarşî nêyeno qebulkerdene. Xo parçeyê xoza vîneno sey ganîyanê bînan. Heme ganî û bêganan parçeyê tebîetî vîneno. Seba aye endustrî awbend, madenan sey qirkerdişê xoza qebul keno, no qirkerdiş zî cuya xo ra dûrî nêvîneno. Awe, heqê heme ganîyan qebul keno, her ganî qasê xo îstîfade keno, seba aye serê awe de heqê mulkî û endustrîyalî ferz nîyo. Ne dewlete ne zî komel kontrolê ey bêsînor nêeşkeno bigîro destê xo. Nê kontrolî de goreyê îhtîyacê merdimî û yê ganîyanê bînan bibo. Senî yew mîlçik û xezale goreyê xo awe ser de manenî merdim zî goreyê ferzîya xo awe ra îstîfade bikero, awe ser de hukm nêkero. Eke na têkilî bixeripîya ameyoxê ganîyanê bînan senî keweno tehluke û vîndî beno yê merdiman zî keweno tehluke. Senî cuyêka ekolojîke de mewzûyê heqê talî çin o, o çax her kes endamê na xoza yo. Wayîrê xoza, xoza yo, ma tena wayîrê emanetî vejîyenî. Neslê merdimî senî dewam keno yê ganîyanê bînan zî do dewam bikero. Ganî mabenê ma û ganîyan de konsensusêk bibo û goreyê nê konsensusî cuye dewam bikera.

Ma eşkenî cuya ma ya kurdan a verêne de nîşanê ekolojîyî bidî. Heywanan rê teda çin o, nameyê înan est o. Verê cû kesêk biqestî ne dare birnayêne û rotêne ne xezale kiştêne û werdêne ne zî morcela pelçiqnayêne. Heme bi şexs ameyêne qebulkerdene.

Ma eşkenî vacî ke komelo demokratîk de merdim eşkeno nameyê gozêran pano, gozê înan biweçîno labelê nêeşkeno semedê rotiş û ticarî fuzulî gilê daran bibirno.

**Komelo demokratîk de cinî**

Semedê komelê demokratîkî de azadîwaza cinîyan zî sey qaydeyê ekolojîkî ferz û mûhîm o.

Ma goreyê tarîx û cigêrayîşan zanî ke bindestîya cinîyan ra dima cuya komelî de faktorê camêrdan bîyo sereke. Nê hukmê cinsî ra pey têduştîye/seyyewbînîye xeripîya. Eke ma rasta zî yew têduştî biwazî ganî ma azadîya cinîyan ra dest pêbikerî. Rolê cinî û camêrdan de ganî hemkarî bibo, hîyerarşî çinî bo. Cinî awankerdoxa cu ya. Hende rolê aye bîyo talî zî ganî rolê aye de rolo esasî û komelkî bêro qebulkerdene. Heşt hezar serrî yo, cinîyî bindestîya camêrdî de mendî. No şaran rê averşîyayîşo komelkî nêardo, neheqîye û xirabîye arda. Hukmîye ra fekveradayîş hukm se ke cinîyan ser o yeno kerdene gani biwedarîyo.

No zî senî bibo? Cinî zereyê komelî de ganî nêbî obje bibî kerdox û rolê xo kay bikerî. No zî heme temsîlîyeto sîyasî, îdarî û komelkî de hemserekîye, hemverfekîye, seyyewbînîye temsîlîyetî bêro kerdene. No sîstem semedê komelê demokratîkî ferz o, bê nê faktorî komelo demokratîk awan nêbeno.

Cuyê ma yê kurdan de herçiqas giranîya camêrdperestî est a zî komel cuye de bi şeklêk rengînîya cinîyan awankerdoxîya cinîyan xo mojneno. Mesela erdramitiş û ronayîşê zerzewatan ra bigîrî heta heywanewnîyayîşan de rolê înan sereke yo. Veyveyan de govendegirewtiş cinî û camêrdî têdir govende gênî. Qiseykerdîşê cematî de cinî fikrê xo eşkena bîyaro ziwan. La çi heyf ke no şekil heta tesîrê dewrê modernî de nika xeripîya. Cinî têkilîyê berardîşî ra ameya cîyakerdene. Rolê aye zî zereyê komelî de zêde ra bîyo talî. Seba aye ma giranîya cinîyan, temsîlîyetê sîyasî û îdarî de nêvînenî, tena hûmara înan nimûne aseno.

Seba ke azadîwaza cinîyan tena semedê înan nîyo semedê azadîya komelê xo yo. Komelê demokratîkî de cinîye awankerdox a, rolê aye kerdoxêka esas a.

**Komelo demokratîk de komun**

Komelo demokratîk de ciwîyayîşê merdimî muhîm o. Seba ke ma pêro zanî yew merdim nêmaneno merdimanê bînan. Cîya-cîya ziwan, kultur û bawerî û fikr est î. Karbeşî est a, ekonomî zî cuya merdimî ser o tesîr kerdo. Ganî heme merdim bizano ke o aye, înan rê tehdît nîyo a, ê zî kesêk rê tehdît nîya/î. Ciwîyayîşê înan yewbînan hêzdar bikero, kesêk hêrişê kesêk nêkero. No senî bibo? Ganî her komel goreyê ziwanê xo, kulturê xo, bawerîya xo, fikrê xo kerdox bêro qebulkerdene. Komunê xo awan bikero. Nê komunî de ganî garantîya her kesî hetê ekonomî, sosyalî, îdarî û ciwîyayîşî ra seypê bibo û hîyerarşî çinî bo. Fikrê komunî de netewperestî, ziwanperestî, kulturperestî, zayendperestî çinî bo. Ganî erjê şaran bêro qebulkerdene.

No konsensusêko asgarî yo. No fikir sey DNA'yê komunî yeno qebulkerdene. No 'kok hucre' eke bibo muşterekê komelî o çax komelo demokratîk beno garantîya şar û kesan.

Awankerdişê komunî awankerdişê aştî zî ano. Komelo demokratîk de cuya zafziwanî, kulturî, bawerî est a. Komelo demokratîk de cuya zafziwanî komelkîya ke derûdorê cinîye de yena şeklgirewtene, ekolojîk, komunkî, pluralîst û erjanê demokratîkan esas gêna.

Bêrê ma pîya 2026î bikerî serra aştî. Bêrê ma na serre bikerî serra komelê ekolojîkî, paradîgmaya azadîwaze ya cinîye û komelê demokratîkî yê komunalî awan bikerî.

| Merkezê Xeberan

# Parîs ra heta ewro: **Tehlukeyê provokasyonan**

Tarîxê têkoşînê azadîya şarê kurdî de tayê rojî est ê ke zerrîya merdimî de birîna ke qet weş nêbena, xorîn kenê. 9ê Çeleyê serra 2013î zî nê rojan ra yew o. Paytextê Parîsî yê Fransa de, hîrê cinîyê şoreşgerî, ameyê qirkerdene. Nê; ronayoxanê Tevgerê Azadîya Kurdî ra Sakîne Cansiz (Sara), Temsîlkara KNK'yî Fîdan Dogan (Rojbîn) û Endama Tevgerê Ciwanan Leyla Şaylemez (Ronahî) bîyê. No qirkerdiş, têna kîştişê hîrê kesan nêbi; no yew operasyonê stratejîk ê "aqilê dewleta xorîne" bi ke waştêne bi nê hawayî vernîya çareserîya meseleya kurdan bigîro.



**Qirkerdişê Parîsî û demê weçînayîşî**

Gama ke merdim nê suîqestî ser o fikirîyeno, çîyo tewr muhîm demê ci yo. Destpêkê serra 2013î de, Dewleta Tirke û Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî mabên de, Îmrali prosesêk dest pêkerdbi. Hêvîya aştîye û çareserîya dîyalogî şarî mîyan de zixm bîbî. Tam nê wextî de, Parîs de no qirkerdiş ame kerdene. Hedef eşkera bi; waştêne ke masa biceviznê, bawerîya mabênê terefan xera bikerê û şerî hîna giran bikerê. Sakîne Cansiz, sey yew sembolê xoverdayîşê zîndanê Amedî û îradeyê cinîya kurde ameye weçînayene. Kîştişê aye, peyamêk bi ke dîya Tevgerê Azadîye. Peyam no bi: "Ma do nêverdê ke şima bi hawayêko sîyasî û dîplomatîk ser bikewê."

**Proseso newe û tehlukeyê suîqestan**

Ewro, mabênê sîyasetê Tirkîya û Kurdîstanî de reyna behsê "prosesê çareserîye" yan zî "normalîzasyonî" beno. Sîyasetmedarî qisey kenê, şar reyna hêvî keno ke belkî gonî vindera. Labelê, tecrubeyê ma yê tarîxî musneno ma ke her gama ke kurdî û tirkî nêzdîyê aştîye benê, "destê tarîyî" kewenê dewre. Hêzê ke estbîyayîşê xo şer û nîjadperestîye ra gênê, qet nêwazenê ke meseleya kurdan bi hawayêko demokratîk çareser biba.

Eke ma bala xo bidê Qirkerdişê Parîsî ser, ma vînenê ke suîqestê sîyasî, çekêka tewr pîle ya hêzanê statukoparêzan a. Di prosesê ke ma tede yê de zî, tehlukeyê suîqestanê neweyan est o. No tehluke têna vera sîyasetmedaranê payeberzan nîyo; roşnvîrî, rojnamegerî, temsîlkarê dezgehanê sivîlan û hetkarê rayberîye zî hedef de yê.

**Meqsedê nê suîqestan**

**Provokasyon:** Hêzê tarîyî wazenê ke şarê kurdî hêrs bikerê ke şar kuçeyan de reaksîyonê tundî bimojno. Bi nê hawayî, zemînê operasyonanê leşkerîyan reyna amade beno.

***Tersnayîş:*** Wazenê ke sîyasetmedaranê kurdan biterisnê ta ke ê waştişanê xo ra tawîz bidê.

***Tasfîye:*** Kesê ke prosesê aştîye de rolê "kilîtî" kay kenê, yenê hedef girewtene ke têkilîya mabênê şar û sîyasetî bibirîyo.


**Têkoşînê vera komployan**

Coka, demêko winayîn de, mesuldarîya sîyasetmedar, roşnvîr û şarê ma zaf giran a. Ganî ma Qirkerdişê Parîsî ra ders bigîrê. Sakîne, Fîdan û Leyla, qurbanê sîyasetê înkar û îmhaye bîyê. Ganî ma bizanê ke 'aştî' têna bi qiseyanê weşan nêameya û nêna. Aştîye, pawitiş wazena.

Eke ewro yew maseya çareserîye ronîya, ganî asayîşê sîyasetmedaran û temsîlkaranê şarî bêro temînkerdene. Herinda ke ma tenya hêvî bikerê, ganî ma bi hişmendîyêka organîze têbigêrê. Dewleta ke vizêr Parîs de tetîk ant, ewro zî eşkena cîya-cîya şaristananê Ewropa yan zî Tirkîya de heman kayî kay bikera.

Sîyasetê kurdan, ganî vera nê provokasyonan hîşyar bo. Şarê kurdî, ganî bi îradeyêkê polîtîkî wayîrê erjanê xo vejyîyo. Çunke tewr cewabo pîl vera suîqestan, xurtkerdişê rêxistinbîyayîşî û berzkerdişê têkoşînê demokrasî yo.

Ma reyna hîrê cinîyanê şoreşgeran, Sakîne, Fîdan û Leyla bi hurmet yad kenê. Vîrameyîşê înan, rayîrê ma roşn keno. Vera tehlukeyê suîqestanê neweyan, çimê ma akerde yê û vîrê ma gandar o. Aştîye, di binê sîya tifingan de nê, bi têkoşînê şaran û bi pawitişê heqanê merdiman yena ronayene.




# Tiştanok

Gelî hêjayan mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd e ku berê di civat û şevbêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

***1- Mamê mino***
Tiştek heye
Tenûra himhimî tijî nanê genimî
Ew çi ye gelo?

***2- Mamê mino***
Her ku dike zîqezîq
Govendgêr ji kêfan dikin wîqewîq
De bêje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***
**1 -** Hejîr **2-** Ribab, kemençe

# Bila xêra rehmetî be

**Hesen Hemkê**

Şerîfo dîsa ji xwe re li karekî digeriya, lê demeke dirêj derbas bû ti karekî li gorî xwe nedît. Paşê ji xwe re pilanek çêkir serî li xapandinê da. Pîkabeke Şerîfo ya kevin hebû û ji firinciyê cîranê xwe re got em bi hev re ticaretê xweş bikin. Şerîfo ji nanfiroş re got her roj ez ê 100 nanî ji te bikirim û bibim bifiroşim lê ji bo pereyan tu yê hinekî bêhna xwe li min fireh bikî.

Xwediyê firinê tima bû û got cîranê delal ma qey ji bo çend nanan tu mala xwe ji vir bar nakî, her hefteyê carekê em ê hesabê xwe bikin û tu yê heqê nan li ser hev bidî min.

Şerîfo dest pê kir roja yekemîn rahişt 100 nanî û çû taxeke feqîran û li wê derê wiha bang kir: 'Kesên hewcedariya wan heye bila bên ji xwe re nan bê pere bibin.'

Xelkê taxê lê civiya û di nav saatekê de nanê xwe li xelkê belav kir. Şerîfo her nanek dida kesekî/ê ji wan re digot; 'Bejin xwedê xêra wê bigihîne rihê rehmetî.'

Şerîfo 3 rojan li ser hev wiha her roj diçû nan li xelkê wê taxê belav dikir. Roja çaran dîsa Şerîfo berê xwe da taxê û vê carê piştî ku xelk ji bo nan li derdora wî civiyan got; 'Ey mirovên hêja kî ji we tûpê gaza wan vala bûbe bînin ez ê bibim dagirim û bila ew jî xêra rehmetî be.'

Şerîfo ereba xwe tijî tûpên gazê kir û bir ew tûp tev firotin. Ji wê rojê de xelkên taxê fatihayê li ser rihê tûpên xwe dixwînin û Şerîfoyê xwedîxêr êdî bi carekê re nema xuya kir.

Di çend salên berê de hin partiyan jî xêr û xêratên wiha wekî Şerîfo dikirin. Hin pakêtên alîkariyê li ser xelkên xizan û hewce belav dikirin. Lê piştî ku di hilbijartinan de dengê xwe dan wan partiyan, dengê wan hat dizîn û heta niha fatihayê li ser dengên xwe yên hilbijartinan dixwînin. Piştî hilbijartinan bêrîkên wan valatir bûn û rewşa wan perîşantir bû û ti sozekî ku ji wan re hatibû dayîn bi cih nehat.



Kewê Redkan

# Diziya sersalê

Heta hejdeh saliya xwe min qet nedizanîbû ka bê sersal çi ye? sala kevn dibore, sala teze tê, herkes dikeve nav hin xeyalan. Ew sal min fêhm kir ku dayika min her êvara sersalê hinduşke ( elok, hindî) dike qurbana sersalê.

Ez jî di nav hinek xeyalên pir dûr û dirêj de dimam. Min digot qey ew sala nû wê di jiyana min de tiştekî teze çêbike... Yanî, weke ku em bêjin; ez ê bi dilketiyê xwe re bizewicim, xaniyekî me yê mezin, derwazê wê jî mezin, heft û heşt zarokên me çêbibin, li ber wî xaniyê me keriyek pez û dewar, erebeyek me hebe. Ez ê jî jiyana xwe li tev li delaliyê xwe xweşik derbas bikim.

Ma çi dibe, dema meriv bi hezkiriyê xwe re bizewice hemû jiyan ji merivan re xweş tê. Haaa, di dema zewaca min de wê daweta min heft roj û heft şevan bidome, heta hetayê wê hemû kes behsa evîna min û daweta min bikin. Xeyalên min ên din jî hebûn, lê niha behsa wan nakim, bila bimîne careke din.

Digotin waaaa, wê sala teze were, em ê di nav de kêfê bikin; heçî merivên xwedî xeyal wê bigihîjin mirazê xwe. Min jî wisa fêhm dikir ji ber gotinên xelkê. Çend sal wisa derbas bûn, min dît qet xeyaleke min nayê cih! Hemû sal wek hev in, tenê em her sal emrekî zêde dibin, ewqas. Sibetira sersalê hemû kes diçin ser kar û barên xwe, ewqas.

Gelo kî derewan dike ji me re? Ger xeyalên me neyên cih, ewqas însan çima dikevin nav hin xeyalên mezin û dawiya wan xeyalan jî nayê? Ya min, ez bixwe bi dilketiyê xwe re nezewicim, ew çû bi keçikek li gundê jorê re zewicî ( keçik jî pir bedew bû bi rastî). Her sal ji xwe re zarokek çêkirin, bûn xwedî mal û bi hezaran heywan li ber şêmîga derê wan in.




Ez jî wisa bi hêrs û stûxwar mam, di nav gund de min nedikarî ez hêrsa xwe bikim der, ji ber ku şerm bû. Ger aqilê min ê niha hebûya, ez ê biçûma li ber derê wan, min jê re bigota 'tu mirovekî tirsonek, bêaqil û derewçiyekî herî mezin î.' Lê min ev gotinên xwe negotin, ji ti kesekî re jî negotin, ew gotinên min di nav dilê min de man heta ku sersala din hat.

Ew roj min biryara xwe da, ez û çend hevalên xwe, wê êvarê em ketin nav hinduşkên wan, me çend heb ji wan dizîn û anî mala hevala xwe. Jixwe hevala min, dayik û bavên wê hema tarî diket erdê ewana jî diketin nav xewê.

Wê êvarê heta nîvê şevê, me di nav goştê hinduşkan de kêfa xwe kir. Sibetirê me dît waye ewana, jin û mêr li pey dizê hinduşkên xwe ketine, ez û hevalên xwe derketin ser banî me li wana mêze kir. Hevala min got; 'Te dît? Me çawa heyfa te hilda, her sal em ê herin diziya wan bikin.' Min got; 'Naa, em diziya wan nakin, lê em ê xeyalên mezintir pêk bînin, bila xeyalên me wisa mezin bin ku dest û devê tu kesekî/ê negihîje wan xeyalên me.'

Va saleke din jî derbas bû, wan dizê hinduşkên xwe nedîtin, min jî ew gotinên di dilê min de mabûn negotin. Heta sersaleke din ez ê li pey kîjan xeyalan bikevim nizanim. Sersala we pîroz be!

# XAÇEPIRS




## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ VE

***3-*** Rengek ***5-*** Cînavkeke tekakes ***7-*** Alavên vêxistina tendûrê ***8-*** Agir ***9-*** Darên hişk ên ji bo şewatê ***13-*** Heskirin ***14-*** Genime hêrayî ***16-*** Rengek ***19-*** Bajarekî rojavayê Kurdistanê ***20-*** Hewcedarê avê ***21-*** Kinc ***22-*** Ezman ***25-*** Noteyeke muzîkê ***26-*** Alava şûştina cilan ***28-*** Nexweşiyeke çermê mirovan

## JI JOR BER BI JÊR VE

***1-*** Beşekî girîng ê wêjeyê
***2-*** Welatekî ku bi tundî û darvekirinê navdar e
***3-*** Berevajî dereng
***4-*** Rewan
***6-*** Berevajî neyênî
***10-*** zikreşî, serhişkî
***11-*** Koma çêlekan
***12-*** Rêya serberjor
***15-*** Berevajî destpêk
***17-*** Cihê ku êmê sewalan didin ber wan
***18-*** Amûreke mûzîkê
***20-*** Ne rast, kelevajî
***23-*** Daneke rojê
***24-*** Endamekî laşe mirovan
***27-*** Dîn

## Bersiva hefteya borî



# BÊMAL-çîrokeke evînê, êş û qederê

Gelek kilam û stranên jinan bi devê mêran hatine gotin bêmal jî yek ji wan e. Ev kilam bi devê mêr hatiye gotin, lê dilê ku di hundirê wî de axiviye, dilekî bi qasî dilekî jinê ye: narîn, xemgîn û xweş e

Weysî Varli

Bêmal kilameke kevn a herêma Semsûrê ye; kilameke ku ji dilê şikestî û ji evîna bêencam hatiye avakirin. Ev kilam li ser çîroka du ciwanan e ku evîna wan bi xwîn û axê re hate nîşankirin. Bûyer li gundê Qenterê, li navçeya Semsatê ya bajarê Semsûrê, pêk hatiye. Qenter du gundên bi heman navî hebûn: yek Qentera Sîna/ Semsatê bû, gundê bavê Êmê (Bêmalê), Hemê Ayîb; ya din jî Qentera Ereban bû ku li aliyê Rihayê bû. Îro her du gund jî di bin ava bendava Ataturk de wenda bûne. Wek gelek war û wargehên dîrokî yên kurdî ku bi projeyên dewletê yên talan û binavkirinê ji bîr çûne, Qenter jî bi qedera Heskîfê re hevpar bû.

Ev kilam çîroka evîna Bekirê navmalî û Êmê, keça axayê wî, tîne ziman. Evîn, ku di destpêkê de bi hêvî û ronahiyê hatiye destnîşankirin, di dawiyê de bi tarî û xemê hate qedandin. Bi demê re serpêhatiya wan du evîndaran ji tixûbê Semsûrê derket, li nav kurdên kurmanc belav bû û bi dengê dengbêjan ji herêmekê derbasî herêmeke di bû.



## 'Bekir û Êmê hev revandin'

Lê çavên gund her dem vekirî ne. Hinek gundiyan ew dîtin û bi zimanên fesad û xirabî çûn ba Hemê Ayîb. Gotinên wan wek agir li ser dilê wî ketin: "Bekir û Êmê hev revandin." Hemê Ayîb, bi hêrs û bi kûrahîya qederê, hinek kes bi xwe re birin û ket pey wan. Li nav çiya û axê, li wir ku dengên mirovan wenda dibin, qeder bi destê mirovan hate nivîsandin. Hin dibêjin bi guleyên reş hatin kuştin, hin jî dibêjin bi kêr û xencerên sar; lê encam yek bû: evîn bi xwîn hate birîn.

Li gor hin çîrokbêjan, Bekir li wir nemiriye, lê bi birîndarî û bi dilê şikestî xwe rizgar kiriye. Êmê hat kuştin û Bekir ji welat dûr ket. Ji ber vê yekê wî navê Bêmal wergirt: mêrê bêmal, bêxanî, bêcih. Ev kilam bû dengê êş û qedera wî. Piştî demekê, Bekir ji derdê Êmê nexweş ket, ket nav nivînan û bi navê wê evînê can da. Kilama Bêmalê, wek axeke ku bi xwîn hatiye şilandin, ji Semsûrê derket û li gelek herêmên Kurdistanê belav bû. Bi devê dengbêjan, bi dengê xem û helbestên dilşikestî, ket nav dev û guhên gel. Ev kilam îro jî wek şermezariyek li ser evîna qedexekirî, li ser qedera reş û li ser dilên ku ji evînê şikestin, bi hêrs û bi xem dimeşe di dîrokê de.

## Kilama Bêmal (Ji devê Avdilhadiyê Zorava)

*Lê lê mekrê lê delalê lê qapî emelê tu dosta emrê min î lê ê way*
*Bêmal bêmalê dînê ez bêmal nibûm çima te ez bêmal kirim.*
*Qapî emelê bêmal nibûm çima te ez bêmal kirim.*
*Te bi serê çol û yabana xistin terk mal kirim.*
*Ji kul û kederê dinyalekê lê ji hesretî berî seyida ya ez nahelim ne pola me ne demirim lê lê*
*Tozanê lê qapî emelê lê lê yedî belayê lê lê weyla tu dosta emrê min î lê*

Delalê lê mekrê belayê Qenter bişewite xweş Qenter e, Qenter bişewite xweş Qenter e

Samîsat bira xira bibe gundê axa û axalere

Kevirê kela Samîsatê kevirkî mezinî bilind e li hemberê Textî qizî Qirêl bi çar niga li ser e. Lawikî esmer e keçikî dîlber e Pozî çilaqî tewrînî zêrî zer e

Xwedao salê heftane eşqa min firyabû mihuba min kete ji xu ber e.

Heçî kesê loma ji min û bêmala min dikin gelo qey ne ji ometa Mihemed û pêxember e. Lê lê

Heçî kesê loma ji min û bêmala min dikin ne ji ometa pêxember e.

Sîng û berê xelqê min î dalyan ji mire mîna kîtabek kîtabê pîran devêm jê ra nivîse zimanê min qelemî qenter darî jê re defter e.

Ez mîna hafiz quranekî welatî Semsûrê erê darê vî danî demê wî dalyan

Bismîllah navê Xaliq û lokman allah û ekber e lê dixwînim ji xura lê ezber e lê lê

Lê lê mekrê belayê te kirime mîna derwêşek derwêşî li Bexdayê

Ez ê bi qosteqê çavê te yî reş û belek kesî ji xu re rakim,

Kirim Feratê Bêlecûkê qayik û gemiya derbasikim.

Ez ê berê xwe bidim topraxê Hind û Yemenê cinazêm çolistana ji digerim xura der bi der e lê lê wax.

Ez bermala bejna te me lê lê ez miştaqê bejn û bala bermalya mala xwe ji heyr û xerabe me lê qapî emelê lê îşsozdarê lê lê way way

Bêmal lê mekrê belayê lê vê sibê navê xelqî min î dalyan hinka digot navê xelqî te yî dalyan eydê ye mi nê digo navê xelqî min î şêxanî dalayan jê re dibên Fatê way

Lê bira ne bi xêrî ne bi ala be daweteke çêbû li gundê Samîsatê ne bi xêr û ne bi ala xirabî ji min û birê te de hatê.

De xirab ji min û birê te de hatê. Ez rabûm şikyayê gerdenî helyayî min ê berê xwe dabû daweta gundê Samîsatê

Nizanîbûm qedera xaliqê rehman e temamî melekê rehmê ser bendê xelqê min î dalyan de hatê.

Ez ê çi bikim li orta orta qenterê û Samîsatê, lê mi go ketibû orta min û te çayê de Feratê

ez benî însan im, ez ne teyr im ne min per û bask ne qolu ne qanadê

piştî şevbihêrka ez ê bifiryama ji xwe ra ser Feratê malik şewitî bihatima ba te way.

Ez ê nikarîbûma piştî şevbihêrka bifiryama bihatima ba te

Bira ne bi xana Xwedê be mala hecî Qadir axa herdû lawê koşkê vê re ev salê heftane ji bextê min û bêmala min re li qentera şewitî danîbûn qereqol û qolux û serbiser hikûmatê lê

Tozanê lê qapîemelê lê weyla tu dosta emrê min î lê

Bêmalê lê lê mekrê belayê tu nizanî bêmal ez û tu ne qapî emelê tu nizanî wa bêmal ez û tu ne.

Ya wele ê te ne mê re ê mi ma ne jin e. Samîsat yek e Qenter didu ne

Samîsat yek e Qenter didu ne Qentera Sîna heftê male Qentera Ereba gundê bavê te nêzî çarsed mal gundekî dêrî gelekî mezin e

Fesad û gelacê gundê me pir in gelek in, şevê nîvê şevan li ber qapiyê bavê te rûniştine

Qal û qineta kuştina simbêlê min î sorî sosinî semeda qetera wa gulyê te yî morî egêlî ji xu re dikine.

Mi go gundîno malîno hevalno hogirno xwedê hebînî ka ji min re bêjin ev çi xeber e çi şor e law dîsa ev çi pirs e çi gotin e lê lê

Ka ji min re bêjin ev çi xeber e çi gotin e lê mekrê belayê ka rabe boxçeyê xweyî qumaşî rake bişewite gundê Qenterî bigere xatir ji heval û yoldaşê xwe bixwaze ser û bin e

Ev gundê Qenterê ji îro pê ve herimî ji me re nabe. Ez û xelqê xwe yê dalyan xu re jê birevine.

Lê mekrê belayê qanûna gazî paşa zor e zagonî çetin e. Divê qanûnekî tevdî îro pêve rastkirine eskerê pêş salê wan ketiye çil û pêncan ji îro pê de berev dikine lê. Bi destê van kurê bavan girtine lê lê. Birine ser dikanê berbera neketine tabûrê nigê wan dixê kur dikine.

Cilê sivîl ji wan sendine cilê resmî li wan dikine piştî salê çil û pênca berê van kurê bavan dane çalê Qerexopan li cepha herbê bilim û talîm û terbiye bi wan dikine lê lê

Lê lê mekrê belayê ka destê xwe di nav mêra de di destê mi kirî va welata herimî ji me re nabe em ê jê birevine o.

Em ê xwe bavê welatik xerîbî nenasî tev li din e. Em ê berê xwe bidin welatê xerîba tozanê Hind û Yemenê welatekî nenasî din e.

Eger Belkî xelq ji me bi pirse bê je kuro lawuko tu xelqê xweî dalyan ji ku ne ku de tên ku de derî hun çiyî hev û din e lê lê

Ez ê bibêm em xelqê welatê jorîn in em firar in mehkûm in sirgûn in. Em ber qanûna gazî paşa direvine. Eger hûn suwala me dikin em xuşk û birayên hev û din e. Belkî xelk bêjin çima reng û benzê we ne yek in, ez ê bêjim lo xelko loma nekin lome çetin e way.

Li reng û benzê me mêze nekine. Zikê dê boxçe ye kerema xaliqî loqman ji ewlaya heye dide yekî dine. Wele em xwe û birayê hev in bavê me yek e wele dayikê me didu ne lê lê wax.

De bavê me yek e dayikê me didû ne. Em sirgûnî ne ber qanûna gazî paşa welatê jorîn ber bi welatê we tê û direvine.

Lê lê mekrê belayê de rabe gelî bira wele taliya dinyayê betal e axir dîsa sonî heye mirine lê lê

Ez bêmala bejna te me lê lê ez miştaqê bejn û bala bermalya mala xwe yî min helî xerabim lê lê tozanê lê qapî emelê lê lê oyoyooooy

Bêmal erê bêmalê dînê ez ê ji îro pêve li ser bejnî te yê dalyan sondxwarî tobedar im ji kara kar û emelê dinê kara nakim.

Ez ê ji îro pêve ji kara kar û emelê dinê kara nakim.

Ez ê çavê te yê reşî hamûdî egalek niqûbî mewalî peydakim

Simêlê xwe yê sorî sosinî badim qiloçî xezala kim

Ez ê bermala bavê te re herim wek dewrana xwe li ba kim lê lê

Ez ê bermala bavê te re herim û bêm xwe li ba kim

Eva sala heftan e bese îro ez ê te ji dê û bava bixwazim hege dan wê te bidin

Hege gava te nedin ez ê destê xelqê xwe yê dalyan bigrim li gundî Qenterê li nav çarsit malê xelk û alemê dilê xu te eşkera kim

Qey bav û birê te yê ya min bikûjin lê lê. Ya bira kursî ya min deynin sêdara min rakin

Şirîtekî bi destî peyda kin

Semedî qenterî gulyê te yî morî egêlî biskê te wê li ber mala bavê te bi êsîrê bira min daleqînin bi darda kin lê lê.

Bira mi daleqînin wê mi darda kin xwedîxêr pir in li dinyayê gelek in ez ê dakevim Herana rengin bextê mala ehmaroxli ez ê şalûlû bilbilek malik wêran ji xwe re hal kim.

Ez ê berê xwe bidim hawara şevitî gundekî belî eyan, ez ê cotekî zilê koçeka tevdî sehana ji xwere peyda kim lê lê

Bi sehera sibê re bi azanya melê re ez ê rûnim li ber serê xelqê xweyê dalyan bi darê tembûrê bi zîlê koçekan bi sewta bilbi lû şalûlê malik şewitî lê lê mekrê belayê axê kendala sar e dîsa bi xelqê dalyan vê sibê çewa ji xewê şêrîn rakim lê lê

***Nişe:*** Ji dengê Evdilhadî yê ( Arzoxlî ) Zorava gundê girêdayî yê Sûra Amedê hatiye deşîfrekirin û nivîsandin. Ji sedema banda deng gelek kevin e hin gotinên sitranê dibe kêm an jî tam nebin.

## Klam yek deng cuda

Kilama Bêmalê bi dengên gelek hunermendan hatiye gotin û guhartin: Evdilhadiyê Zorava, Mahmûdê Hesê, Mehemedê Şilbê, Mahmûd Qizil, Silo yê Gulê, Şakiro, Mehmedcanî Sêlem, Dawidê Xilo (li Radyoya Rewanê) û Baqî Xido li Binxetê. Li gor şîroveya Mehmedcanî Sêlem ê Kolikî, ev kilam bi sê şêwazên herêmî tê dabeşkirin: ya Kolikê, ya Sêwrekê û ya Berazan. Wek her straneke kurdî, ev kilam jî xwedî çîrokek e; çîrokeke ku pîvan û usûlên xwe hene û bi şertên civata dengbêjan hatiye hûnandin.

Bi gelemperî, piraniya stranên kurdî bi devê jinê hatine gotin; lê di nav wan de hinek bi devê mêr jî hene ku mêr di wan de wek jina bêçare, bi dilê şikestî û bi hêviyên şikandî, xwe tîne ziman. Bêmal jî ji wan e. Ev kilam bi devê mêr hatiye gotin, lê dilê ku di hundirê wî de axiviye, dilekî bi qasî dilekî jinê ye: narîn, xemgîn û bi qeder re şerker.

## Desîfreya strana Evdilhadiyê Zorava

Çîroka ku herî rast û bêguherîn tê ziman, ya Evdilhadiyê Zorava ye. Strana ku Eyşe Şan gotiye û ku navê Abdullah Nail Bayşu tê xistin, bi vê çîrokê re têkiliya rastîn nîn e. Ev nivîs li ser desîfreya strana Evdilhadiyê Zorava ye, wek ku ji devê wî hatiye wergirtin.

Bekir navmaliyê axayê gundê Qenterê, Hemê Ayîb, bû. Di nav malê de, dilê Bekir û Êmê bi hev ket. Evîn bi hêviyê re dest pê kir, lê bi fesad û gotinên derdorê Hemê Ayîb hate têkçûn. Axayê gundê, ku şeref û rûmeta malê li ser her tiştî didît, razî nebû keça xwe bide navmaliyekî. Bi destê qederê û bi destê mirovan, Êmê bi yekî din re hate zewicandin û Bekir jî ji gundê xwe hate qewirandin.

Dema dawetê hat, gund bi dengê def û stranên kêfxweş tije bû; lê li dilê Bekir û Êmê kevirekî giran radibû. Ew her du dizanibûn ku vê şevê ne şeva kêfxweşiyê ye, lê şeva dawiyê ya hevdîtinê ye. Di nav qelebalixê de, çavên wan bi hev ketin û bê gotin soz dan hev. Gava şev tarî bû, ew bi hev re ji gund derketin. Ax û çiya şahidên revîna wan bûn; dilên wan di nav sîngê wan de bi tirs û hêvî lêdan dikirin, lê evîn wan ber bi pêş ve dikişand.

xwebûn

5 - 11 Çile 2026 / e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 316

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Adar Gulan, Heval Dilbihar, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco, Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Mevlana Halit Mahallesi Turgut Özal Bulvarı Umut 2 Konutları A Blok 4/9 **Bağlar - Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Kurdistan bi berfê xemilî

Welatiyên Kurdistan û Tirkiyeyê sala 2026an bi barîna berfê pêşwazî kir. Ji ber barîna berfê ya zêde rêya nêzî 3 hezar gundan li çûn û hatinê hatin girtin. Her çend rê hatin girtin jî, cotkar û rêncber bi barîna berfê kêfxweş in û zarokan kêfa berfê derxist



Navenda Nûçeyan

Bajarên Kurdistanê sala 2026an bi berfê pêşwazî kir. Di salên dawî de ji ber ku barîna berfê kêm bû, bi taybet çavê cotkar û rêncberan li berîna berfê bû. Her çend rêya bi hezaran gundan hatibin girtin jî barîna berfê gundî û cotkar kêfxweş kirin. Ji ber ku çend rojan li ser hev berf bariya, li 21 bajarên Tirkiye û Kurdistanê rêyên nêzî 3 hezar gundan hatin girtin. Li hin cihan zêdeyî metreyekê berf bariya û li gelek cihan aşût ketin xwarê. Ji ber ketina aşûtan gelek welatî di bin berfê de man. Dibistan hatin girtin û zarokên derketin kolanan kêfa berfê derxist.

Li Şirnex, Mêrdîn, Amed, Wan, Qers, Agirî, Colemêrg, Erzirom, Xarpêt, Riha, bajarên Rojava û Başûr û gelek bajarên din ên Kurdistanê bi rengê berfê xemilîn.

**Şirnex**

Li gundê Şilyanê yê Şirnexê welatî çûn hawara koçerên ku di berfê de asê mabûn. Gundî bi motoran çûn herêma ku koçer lê ne û berfa li ser konên wan ên ku bi hezaran ajal tê de bûn paqij kirin. Ajal ji bo cihekî ewle hatin veguhastin û koçeran ji bo vekirina rê bang kir. Koçeran banga alîkariyê kir û xwest ku ji bo parastina sewalan alîkarî bê dayîn.

**Cizîr**

Li navçeya Cizîrê ya Şirnexê piştî 5 salan 31ê kanûnê cara ewil ji danê nîvro pê de berf bariya. Rêya di navbera Cizîrê û Şirnexê de ji ber berfê hat girtin. Di navbera Cizîr û Şirnexê de bi dehan wesayît di rê de man û zarok jî di nav wan welatiyên de hebûn. Di navbera navçeya Elkê û Şirnexê de, navçeya Qileban û Şirnexê jî ji ber berfê rê hatine girtin.

**Mêrdîn**

Piştî barîna berfê ya zêde ku bandor li tevahiya navçeyên Mêrdînê kir, Şaredariya Kerboranê ji bo dabînkirina veguhastina ewle ya welatiyên xwe, bênavber xebatên paqijkirina berfê kirin. Ekîbên şaredariyê bi giranî xebatên paqijkirina rêyan, kolanên teng, navenda navçeyê, tax û gundan kirin. Hevşaredar Asya Gezer, li gel endamên meclisê û karmendên şaredariyê, xebat kontrol kirin û beşdarî paqijkirina berfê bû.

**Amed**

Li bajarê Amedê piştî salên dirêj cara yekemîn zêdetirî 25 santîman berf bariya. Li nav bajêr barîna berfê giha heta nîvmetreyî, li bejahiya bajêr derket heta metreyekê. Ji ber berfa zêde rêyên gundan û navçeyan li çûn û hatinê hatin girtin û piştî demekê rê hatin vekirin. Ji ber berfa zêde welatî bi zor û zahmetî çûn ser karên we û zarok bi berfê şa bûn. Ji ber berfa 27ê kanûnê rê û cadeyan qeşa girtibû û ev berfa serê salê bariya rê li trafîkê girt. Ji ber gelek welatiyên di rê de şemitîn hinek ji wan destê wan şikest û hinek birîndar bûn. Gelek qezayên trafîkê çêbûn.

**Wan**

Li Wanê jî berf û bahoz li ser hev hat. Ji ber barîna berfa zêde li 10 navçeyên Wanê rêyên 569 gundan hatin girtin. Li Wanê ji ber berfa zêde a ku di saetên şevê de dest pê kiribû, rêyên gelek gundan hatin girtin. Li Miksê 70, Elbakê 12, Ebexê 48, Şaxê 100, Artemêtan 11, Payîzava 126, Bêgiriyê 24, Mehmûdîyê 3, Tûşbayê 33 û Rêya Armûşê 20 bi giştî rêyên 569 gundan hatine girtin.

**Qers**

Li bajarê Qersê ku her sal berf dibare, careke din bariya. Ji ber barîna berfê rêya 41 gundan li çûn û hatinê hat girtin. 4 gundên girêdayî navenda Qersê, 3 gundên girêdayî Şuregelê, 15 gundên girêdayî Zarûşadê, 6 gundên girêdayî Dîgorê, 5 gundên girêdayî Qaxizmanê û 8 gundên girêdayî navçeya Qamuşanê li çûn û hatinê hatin girtin.

**Colemêrg**

Li Colemêrgê rêyên zêdetirî 384 gund û mezrayan hatin girtin. Li Colemêrg û navçeyên wê bi rojan ber li ser hev bariya. Berfê bandoreke dijwar li ser jiyana welatiyan kir. Stûriya berfê metreyek derbas kir û li gelek cihan aşût hatin xwarê. Rêbejên Colemêrg-Wan û Colemêrg-Şirnexê ji ber aşûtan hatin girtin. Li Colemêrgê niha rêyên 110 gundan û 274 mezrayan hatine girtin. Li navenda bajêr jî ev du roj in rê girtî ne. Welatiyan bertek nîşanî bêdengiya midûriyeta rêbejê û şaredariyan da.

**Agirî**

Li bajarê Agiriyê jî her çend berf bariya bû jî vê hefteyê zêde bariya. Ji ber barîna berfa zêde li Agirî û navçeyên wê rêyên 423 gundan li çûn û hatinê hatin girtin. Ji ber barîna berfê welatiyên derketin derve û xwestin biçin ser karê xwe zehmetî jiyan. Li navceya navendî rêyên 89, li Bazîdê rêyên 27, li Giyadînê rêyên 30, li Eleşgirtê rêyên 41, li Avkevirê rêyên 37, li Xamûrê rêyên 38, li Panosê rêyên 93 û li Dutaxê rêyên 68 gundan bi giştî rêyên 423 gunran ji ber berfa zêde hatin girtin. Welatî li gundên xwe asê man.

**Erzirom**

Li bajarê Erziromê jî ji ber barîna berfa zêde gelek qezayên trafîkê pêk hatin. Li gorî hişyariya Midûriyeta Giştî ya Meteorolojiyê bajarên Erzirom û Qersê dê serê salê bi berfek dijwar pêşwazî bike. Ji ber sermaya zêde jî li gelek cihan cemed çêbû. Dîsa li hin cihan jî qezayên trafîkê pêk hatin. Li ser rêya Erzirom Aşqaleyê maşîneyek qelibî û qeza çêbû.

**Lolan**

Li gorî nûçeya RojNewsê; li gorî agahiyan ji duh êvarê ve, li zozanên Lolan a ser bi bajarokê Sîdekana bajarê Hewlêrê ve, barîna berfê dest pê kiriye û heya niha jî dewam dike. Hat zanîn ku ji ber barîna berfê agahî ji 21 kesan nayê wergirtin. Tê gotin ku 13 kes ji wan xelkê rojhilatê Kurdistanê ne û yên din jî xelkê başûrê Kurdistanê ne.

**Qamişlo**

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê (Rojava) jî piştî demek dirêj berf bariya. Bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê serê salê bi berfê pêşwazî kir. Ji ber berfa zêde di rêyên navbera Dêrik, Girkê Legê, Tirbespiyê, Qamişlo û Amûdê, Kantona Firatê û Kantona Reqayê de zehmetî çêbûn û ajokaran zahmetî kişandin. Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê piştî 5 salan berf bariya. Berfa ku 29ê kanûna 2025an dest pê kir, li bajarên Dêrik, Girkê Legê, Çilaxa, Tirbespiyê, Qamişlo, Amûdê, Dirbêsiyê, Til Temir, Hesekê û Kobanê erd sipî kir. Li bajarên Reqa, Tebqa û Dêrazorê jî baran bariya. Piştî hişkesaliyan barîna berf û baranê rûyê cotkaran geş kir. Lê li aliyê din berfa ku 31ê kanûnê jî wekî şilope (berf û baran di nav hev de) dom kir, li hinek bajaran bandor li ser herka tirafîkê kir. Li hin deverên li ser rêya Qamişlo-M4 (rêya Enbara), Qamişlo-Amûdê û Girkê Legê-Dêrik çend seyare ji rê derketin û hinek jî qulibîn. Berfa herî zêde li bajarê Dêrikê û derdora wê bariya, lewma rêya hinek gundan ji bo demeke kurt hat girtin. Barîna berfê her çend çûn û hatina mirovan zahmet kir jî bereket zêde kir.

**Riha**

Li Rihayê piştî 57 salan yekem car berf nêzî 30 santîmî bariya. Bajarê ku havînan germahî derdikeve 50 pîleyî, piştî 57 salên dawî yekem car berfeke ku 30 santîmî derbas dike bariya. Berfa ku di 31ê kanûnê de dest pê kir, heta serê salê berdewam kir.